


ÎLON 2022

KURDÎ

# The Hall



## 13. FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA LONDONÊ



**KURDI COUTURE:**  
CILÊ KURDÎ  
DIKE XEMLA  
KEÇÊN BIYANÎ  
HEVPEYVÎN:  
EROL BAŞAK

**TÊKÇÛNA NOMOSÊ**  
NECAT ZIVINGÎ

**YILMAZ GÛNEY**  
Û HIŞMENDIYA WÎ  
YA KURDISTANÎ  
SÎMON SULEYMANÎ

**ENFAL:**  
BI SÛREYA QURANÊ  
KURD QETILKIRIN  
ERCAN DAG

**QEDRÎCAN:**  
NIVÎSKARÊ KESERKÛR  
Ê LI SIRGÛNÊ  
SERDAR CIWAN



TheHallkurdî  
E-kovara çandî ya mehane  
Hejmar 9, Îton 2022

**Damezrîner**  
Osman Kômûrcû  
Erol Başak

**Edîtor**  
Erol Başak

**Redaksiyon**  
TheHallkurdî

**Rûpelsazî**  
Ridwan Xelîl  
ridwanxelil@gmail.com

**Bergsazî**  
GrafiKURD

Navnîşan  
London UK

**The Hall Kurdî**  
Endama Koma  
Kovargerên Kurd e

www.thehallkurdî.com

thehallkurdî@gmail.com

+44 7915 413436

@KurdîHall

TheHallKurdî

The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.  
Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe bersivek  
û ne mecbûr in ku ew mîna yê weşanger û edîtor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,  
materyal û naverokên din bi niyeteke safî hatine amadekirin.*

# NAVEROK



## Nameya Edîtor

Vê mehê çend gotarên me li gorî konseptê The Hall Kurdiyê hinek dirêjin. Me ji bo kovarê ew hinek kurtkirin. Lê tevahiya gotaran hûnê bikarin li ser malpera me [www.thehallkurdî.com](http://www.thehallkurdî.com) bixwînin.

Erol Başak  
Rojnamevan, London

► 4



## LKFF Vedigere Ekranên Zîv

Hevpeyvîn Erol Başak  
Rojnamevan, London


► 5



## Têkçûna Nomosê

Necat Zivingî  
Nivîskar, Stenbol

► 23



## Yilmaz Gûney û Hişmendiya Wî ya Kurd-istanî

Sîmon Suleymanî  
Rojnamevan, Parîs

► 13



## QEDRÎCAN: Nivîskarê Keserkûr ê Li Sirgûnê

Serdar Ciwan  
Rojnamevan, Mêrdîn

► 26



## KURDÎ COUTURE: Cilê Kurdî Dike Xemla Keçên Biyanî

Hevpeyvîn Erol Başak  
Rojnamevan, London


► 16



## Diego Rivera

Salome Cizrawî  
Blogger, Cizîr

► 32



## ENFAL: Bi Sûreya Quranê Kurd Hatîn Qetlîkirin

Ercan Dag  
Rojnamevan, Stenbol

► 20



## Di Muhteşemiya "BÊDER" de Lêgerîna Înşakirina Dahatûyekê; Welatekî

Welat Ramînazad  
Antropolog, Amed

► 38

# NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

*Silav, xwînerên hêja yên The Hall Kurdiyê.*

Havîn qediya, bi meha Îlonê em ketin demsala payîzê. Îsal li Londonê havîneke germ hebû. Mîna berê bi ewr û baran derbas nebû, lê te digot qey bajarekî Kurdistanê ye, wisa germ bû. Seba wê hewayê xweş em Kurdên li Londonê li parkên xweş û fireh yê vî bajarî tere dilê xwe çûn govend û seyranê.

Havîn ji bo karê kovargeriyê jî xweş û bi bêr bû. Me vê mehê jî kovareke têr û tije û rengîn amade kir. Vê hejmarê dîsa nivîskarên nû yê hêja û biqîmet bi nivîsên xwe kulîlk danîn ser xemla The Hall Kurdiyê.

Ez dixwazim bi berga Kovarê dest pê bikim. Me cî da 13. Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê. LKFF piştî pandemiyê cara yekeme vedigere ekranên sînemayê. Di navbera 23-30yê Îlonê de seranserê hefteyekê dê sînamahezên Kurd bi fîlmên bijartî dê li Londonê dawî li hesreta sînemaya kurdî binin. Me bi dîrektore Festîvalê birêz Ferhan Stêrk re hevpeyvînek çê kir. Hûnê hemû hûrguliyên festîvalê di hevpeyvîna me de bibînin.

Mijareke din ya vê hejmarê derhênerê Kurd ê nemir Yilmaz Gûney e. Bi boneya salvegera koça wî Rojnamevan Sîmon Slêmanî ji Parîsê li ser "Hişmendîya Kurdistanî ya Yilmaz Gûney" nivîsî.

Li Londonê keçeke Kurd a ciwan û serkeftî bi navê "Kurdî Couture" marqeyek ava kiriye û cil û aksesûrên kurdî çêdike. Prosha Ahmad cilê Kurdî li biyaniyan dike. Agahiyên zêde derheqê vî karê pîroz de di hevpeyvîna me de ye.

Meha Îlonê salvegera bidawîbûna operasyona Enfalê ye. Lê hestiyên bi sed hezaran Kurdên Başûrî hêj nehatine dîtin. Rojnamevan Ercan Dag operasyona Enfalê bi sernavê "Bi Sûreya Quranê Kurd Qetlîkirin" nivîsî.

Nivîskar û Lêkolîner Necat Zivîngî di vê hejmarê de balê dikşîne ser xirabiyên mirovan, nexasim li ser medyaya civakî. Ka binêrin çî tespîtên birêz Zivîngî hene û "Tekçûna Nomosê / Namûsê" çawa çêbûye.

Em vê hejmarê nivîskarekî Kurdistanî bibîrtînin. Qedîr Can: Nivîskarê Keserkûr yê Li Sûrgûnê. Biraziyê wî Serdar Ciwan ji bo kovara The Hall Kurdiyê nivîsî.

Ez dixwazim wek mizginiyekê ragihînim ku ji vê hejmarê pê ve nivîskara hêja û qedirbilind Salome Cizrawî dê li ser felsefe û hûnerê ji bo The Hall Kurdiyê binivîse. Nivîsa wê ya yekem li ser hûnermend Diego Rivera ye.

Nivîsa dawî jî derheqê ravekirina filmê "Bêder" yê Arîn Înan Aslan de ye. Antropolog Welat Ramînazad bi şîroveyeke gelek xweş muhtêşemiya filmê Bêder radixe ber çavan.

Vê mehê çend gotarên me li gorî konseptê The Hall Kurdiyê hinek dirêjin. Me ji bo kovarê ew hinek kurtkirin. Lê tevahiya gotaran hûnê bikarin li ser malpera me [www.thehallkurdî.com](http://www.thehallkurdî.com) bixwînin.

*Bila fikr û hizr û xwendin û xeberdana we bi Kurdî be. Lewra jîyan bi Kurdî xweş e. Dem baş.*

# K LKFF

## VEDIGERE EKRANÊN ZÎV



[f](#) @londonkurdishfilmfestival  
[v](#) @londonkurdishfilmfestival  
[t](#) @lkff [i](#) @lkff

13. Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê meha Îlonê dest pê dike. Festîval dê di navbera 23ê û 30yê Îlona 2022an de pêk were. Piştî 4 salên navberdayî LKFF vedigere salonên sînemayê. Lewra ji ber pandemiya kovîdê festival du salan online hate kirin. Loma kelecaneke mezin heye. Îsal serlêdan çênebûn tîma LKFFê bixwe film bijartin. Bîtevahî 31 film dê bîn nîşandan. Em bi dîrektorê festîvalê Ferhan Stêrk re axivîn. Wan festîvaleke çawa amade kiriye kerem bikin ji hevpeyvîna me hîn bibin.

**Ez dixwazim wiha dest pê bikim. 2 festîval online çêbûn. Ji ber kovîdê. Dema pandemiyê ji bo LKFFê çawa derbas bû?**

Di Nîsana sala 2020î de me biryara taloqkirinê da. Lewra herkes jê tesîrdar bû. Her der hate girtin, sînema girtîbûn, dinya alem xwe kişand malê. Di navbera Nîsan û Tebaxê de em dudilî man. Gelo em festîvalê çêkin an na? Me got heke em çêkin divê online be. Me berê çênekiribû loma em li ser çawaniya wê fikirîn. Û axir me li youtubeê kanala LKFFê vekir. Me weşana belaş çêkir. Me ji vî awayî re got festîvala bi tarza gerilla. Lewra me nekarî ji fîlmên metrajdirêj distûrê bistînin lê me ji hemû fîlmên metrajkurt destûr stand. Ev hejmara 11an bû û me danîşana 48 filman kirin. Ji bo me gelek bi kêf derbas bû. Herwisa em hîne festîvala online bûn.

Hejmara 12an rehetir bû. Lewra tecrûba me hebû û em

13<sup>TH</sup>  
LONDON  
KURDISH  
FILM FESTIVAL  
23-30  
September 2022

فستیفالی فیلمی  
کوردی  
Festîvala Fîlmên Kurdî ya London


K

THE NATIONAL LOTTERY  
RIO CINEMA  
FAN  
VUE  
THE PRINCE CHARLES CINEMA  
BITARAKI  
Che-Men Cafe & Restaurant  
ATAS LONDON  
PUS CLUB  
EMURY  
ALBA  
CREATIVE  
GOVERN LONDON  
miya

amade bûn. Me vê carê platformek ava kir. Me 100 fîlmên baştirîn yên sînemaya Kurdî li wir parve kirin. Dîsa bê pere bû. Û me navê wê kir Festîvala Fîlmên Kurdî ya Global. Em bi gelek derhêneran û nûnerên festîvalên din re xebitîn. Di wê pêvajoyê de em gelek tişt hîn bûn. Tecrûbeyeke mezin bû ji me re. Kêfa me gelek pê hat.

**Pistê du salên li onlineê hûnê îsal bi temaşevanan re werin ba hev. Hestên we çi ne? Kelecaneke mezin heye Û we îsal festîvaleke çawa amade kiriye?**

Atmosfera sînemayê gelek cuda ye. Kesên sînemahez, kesên wekî hev hîs dikin û frekansê wan wekî hev e, gava ku tîna ba hev û li fîlmê temaşe dikin tahmeke pir cuda çêdibe. Bi rastî min gelekî bêriya wê yekê kiriye. Dîtinê fîlmên Kurdî li ekranên mezin jixwe xewna derhêner û çêkerên filman e. Ev 4 sal in em jî bi hesret li



bendê ne ku li Londonê danîşana filman bikin. Em bikelecan in. me 24 derhêner, rojnameger û akademîsyen ji derve vexwend Londonê. Jixwe berpîrsiyariya me ye ku em temaşevan û derhêneran bînin cem hev. Li Londonê eleqeyeke mezin heye ji sînemaya Kurdî re. LKFFê ev yek kir. Îsal 9 filmên metrajdirêj hene, 6 belgefilmên dirêj hene, 10 kurtefilmên fikşîn hene û 6 belgefilmên kurt hene. Bi tevahî 31 film hene. Merasîma vekirinê dê li Wood Greenê li sînemaya Vue bibe. Vue sînemaya herî fireh ya Bakurê Londonê ye. Em ê 4 rojan li vir bin. 3 rojan jî em ê li Dalston Hackneyê li sînemaya Rio bin. Roja dawî jî em ê galaya girtinê bi filma Zaroktiya Îmad li navenda Londonê li sînemaya Prince Charles bikin.


### Babeta festîvala îsal û mijarên filman çi ne?

Bernameyek heft rojî ye. 31 film dê bên nîşandan. Zêde nîne. Me bernamêyê wek butîk, wek bijartiyên LKFFê pênasê kir. Îsal filman me bixwe bijart. Lewra piştî festîvala 12an hedefa me ew e ku em dixwazin filmên nû derketî bînin ber temaşevanan. Em piştî 4 salan vedigerin ekranan. Loma me xwest bi awayekî nû û teze em vegerin. Em dikarin bêjin babet “nûbûn” bixwe ye. Em di filman de jî vana dibînin. Bernamê bi filma “Cîran” ya Mano Khalil dest pê dîke. Li Brîtanayê dê cara yekem bê nîşandan. Em jî gelek pê kêfxweş in ku filma derhênerkî ji Rojavayê Kurdistanê nîşan bidin. Lewra yekem care ev dibe. Film ji me re çi dibêjin? Derhêner her çiqas behsa êş û azar û problemên me Kurdan bikin jî ji aliyekê ve behsa hêviyên me yên ji jiyane jî dikin. Em sêya kîjan hêviyan ji nav van êş û belayan derdikevin û li ser rêya xwe berdwam dikin? Derhêner li ser vê sekinîne. Di civaka me de bi qasî nan hewcetiya me bi hêviyê jî heye. Di pirraniya filmên festîvalê de qetliyama li Şengalê heye. Lê behsa têkoşîn û hêviya jiyane jî heye. Helbet evîn jî. Tevî wan zordarî û tadeyan hezkirin û evîn jî di filman de hatine vegotin.

Ev yek hêviya min geş dîke. Ger têkoşîn hebe jiyane jî berdwam dîke.

### Îsal we filman çawa bijart? Kriteer çi bûn?

Îsal me serlêdan qebûl nekîr. Me xwest em bi filmên bijartî festîvalê bikin. Û me ji nava filmên nû derketî bijart û ew xistin bernamêyê. Bi giştî ji bo ku ji filmekê re bikare bê gotin filma Kurdî ye 2 kriteerên sereke hene. Yek, divê mijara filmê derheqê Kurdan de be. A diduyan, divê derhêner Kurd be. Lê em lê dinêrin ka derhêner bi çi hestê filma xwe çêkiriye. Em dixwazin wan derhêneran derxin pêş. Ji bo sînemaya netewî ava bibe û pêk were lazime derhêner çavkaniyên çanda xwe bi rîtuêlên çanda xwe bikarbîne, hilberîne. Em cî didin kesên wiha. Tenê kriteera me ev e. Îro tu bala xwe bidî Brîtanayê û filmên Îngilîzan, ew jî dixwazin ku film ji sedî 60 li vir bê kişandin û divê zimanê wê Îngilîzî be.



**Tiştên nû yên di festivalên berê de tunebûn lê isal hebin çi ne?**

Îsal em ê komxebatek li dar bixin. Humermenda ji Başûrê Kurdistanê ku postera festîvalê jî xêz kir, Soniya Ahmed dê workshopê bide. Di komxebatê de ew ê li ser applîkasyoneke tîlefônên baqil nîşan bide ka nîgarkêşiya dijîtal çawa tê kirin. Di nava 2 saetan de ew ê li ber me hîn bike dîzayna dijîtal çawa tê kirin. Ji xeynî wê panêlek heye. Ji her parçeyên Kurdistanê mirov dê bîn. Sê derhêner Mano Khalil, Sawkat Amîn, Mehmet Ali Konar û akademîsyen Engîn Sustam dê beşdar bidin. Mijar di sînemaya Kurdî de çîrokbêjî û pêşeroja sînemaya Kurdî ye. Wekî din bîranîna nivîskar Mehmet Aksoy heye. Lewra hêja Mehmet Aksoy di sala 2017an de li Bakurê Sûriyê gava têkoşîna li vir dikişand jiyana xwe ji dest dabû. Ew rewşenbîr, kedkar û aktîvîst bû. Di 27ê îlonê de em ê wî bibîr bînin û jiyana wî pîroz bikin. Îsal dê xalîçeya LKFFê hebe û stûdyoyeke me hebe. Emê li wir bi her mêvanan re hevpeyvîn û suhbetan bikin. Îsal hedefa me ya sereke ev e: Em dixwazin ji nêz ve li xebatên derhêneran binêrin. Em ê ti filman paşguh nekin û bi hûrgulî li ser filmên wan bisekinin. Em dixwazin li lîstîkvaniyan, li senaryoyan binêrin û li serê biaxivin.

**Îsal li eywanên sinemayê film dê bîn nîşandan û temaşevan bîn. Hêvî û pêşbîniya we çi ye di warê beşdarbûn û hatine sînamahezan de?**

Êdî li dinyayê festîval bi awayekê hîbrît pêk tên. Yanî hem on-lineê hem jî li mekanên fîzîkî tên kirin, ji bo ku xwe bigihînin zêdetir temaşevanan. Lê mixabin em îsal online nikarin bikin. Ew platforma me berdewam nake. Em ji bo vê projeyekê amade dikin û li çavkaniyeye peryê digerin. Lê em ê hemû videoyên hevpeyvîn û sohbetan li ser hesabên xwe parve bikin.







Di hêla fîzîkî de em hêvî dikin ku eywanên sînemayê tije bibin. Navbereke dirêj çêbû. Temaşevanan jî niha bêrf kirine. Bi min dê salon tije bin û di ser de cî jî nemîne. Gava hemû salon tije bin dora 3 hezar temaşevan dê bîn.

**London li dinyayê paytexteke mezin e. Ji bo sînemageriyê jî ciheke muhîm e. Li Londonê eleqe û piştgrîya saziyên sînemayê ji LKFFê re heye gelo?**

London mîna New York û Hollywoodê ji bo sînemaya modern ciheke pêşeng nîne. Lê ji bo filmên bi qalîte derkevin û tiştên ku li dinyayê berê nehatine kirin, nehatine kifşkirin çêbe piştgrîya BFI, Endûstriya Fîlman ya Brîtanyayê, gelek heye. Ji bo belgefilmên navdewletî bûtçe û pereyêke cidî vediqetîne. Ev gelek girîng e. BFI ji bo sînemaya Kurdî jî bû model û pêşeng. Di sala 2001ê de dest pê kir. Piştgrî da Festîvala Filmên Kurdî ya Londonê û Festîvalên din ên Kurdî û piştgrîya wan dewam dike. Festîvalên din mezin bûn. Hinek ji wan ji LKFFê çêtir jî kar dikin.

**Ji bilî bajarên Kurdistanê li gelek welatên cîhanê jî festîvalên filmên Kurdî têne kirin. Gelo ev yek dikare xîzmeta avabûna endûstriya sînemaya Kurdî bike?**

Bi ya min festîvalên wiha ji bo avakirina Endûstriya Sînemaya Netewî pêngav in. Fîkr û hizra hevpar ya festîvalan ev e: Sînemaya netewî dê çawa bi pêş bikeve? Ev festival çi dikin? Fîlman berbelav dikin. Ji bo ev film bilez li gelek deran bîn danasîn bi hev re dikevin tîkiliyê. Piştgrîya pereyî li hev dikin. Êdî mijareke wiha di rojeva van festîvalên Kurdî de heye. Gelo em ê bikarin hewzeke hevpar

ava bikin? Wek Hewza Fîlmên Netewî. Em dibên çavkaniyeke pereyî ava bikin û butceyê bidin sînemagerên ciwan yên Kurd. Haziriya vê heye. Û ev yek dê rojekê pêk were. Lê niha nizanîm, kengî, li kû û di nav şert û mercên çawa de pêk were. Navenda wê kû der be, nizanîm. Tu bêjî hewcetî pê ye? Belê, teqez heye. Îro ciwanekê/î Kurd bixwaze filmekê çêke, ne pêkane ji xwe re butçe peyda neke. Ji ku derê butce bistîne, divê bi ya daxwaz û mercên wan bike. Heke wisa neke, bi piranî aqûbeta wan sansûr e. Sansûr li Îranê jî heye, li Iraq û Tirkîyê jî. Lê gava ku em çavkaniya xwe, bi realîteya xwe Endûstriya Fîlmên Kurdî ava bikin, dê ev ciwan bikarin bi azadî film çêkin. Ev ê çawa bixwazin bikarin wisa biaxivin. Ma ji vê xweştir heye? Tê çîroka xwe bi zimanê xwe û bi awayî xwe vebêjî.

**Bi sînemayê meriv dikare baştir xwe îfade bike. Ez mer-aq dikim gelo ev festîvalên Kurdî niha nikarin bi yekhêzî butçeyekê ava bikin, bi derhênerên Kurd filmna bidin çêkirin?**

Teqez dikare ev yek bê kirin. Jixwe bi festîvala 12an ku wek festîvala Global hate kirin, em bi hemû festîvalên Kurdî re ketin têkiliyê. Berlîn û Duhok hê tevli me nebûn. Lê şewrên me bi wan re jî dewam dike. Ez behsa hemû festîvalên Kurdî yên li cîhanê dikim. Ji Moskova, New York, Amsterdam, Hamburgê bigrin heya Stenbol, Diyarbekir û Silêmaniyê. Yanî bi hemû Festîvalên Fîlmên Kurdî re plarformeke hevpar ya ragihaninê heye. Ev armanc em anîn cem hev. Destpêka her tiştî axaftin e. Ji xwe piştî van axaftinan fikra Endûstriya Sînemaya Kurdî derket hole. Ji bo vê butçe lazim e. Niha her festîval bi îmkanên xwe li piya ne.

**Brêz Ferhan Stêk, Dîrektore Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê ez gelek spas dikim. Tiştê ku tu bixwazî lê zêde biki heye?**

Ez kedkarekî sînemayê me. Dil dixwaze hemû astengên ber me rabin em wisa fîlmên xwe çê bikin. Ev derhênerên kurd tevî gelek astengiyan fîlmên xwe çê dikin. Ew piştgriya mezin heq dikin. Hin ji wan mala xwe difroşin, ereba xwe difroşin wisa fîlma dikşînin. Bi hezkirin û evînî xîzmeta sînemayê dikin. Ez gelek şanaz û ser bilind im ku ez jî



xîzmeta wan dikim. Tevî hemû astengî, şer û bobelatan Kurd dev ji jiyane bernadin. Ev têkoşîna wan pir biqîmet e. Ti hêz dê nekare destê Kurdan ji çêkirina sînemayê û vegotina çîrokên xwe bikşîne. Ev mesejê mezin e.


Ez wisa bawer dikim ku temaşevan jî dê bi vê zanayî û hezkirinê werin seyra van fîlman. Îsal me festîvaleke gelek xweş û rengîn amade kir. Ji xeynî fîlman workshop û panêlên sûdmend hene. Bila ti kez jê nemîne. Bila gelê me û sînamahezên li Londonê salonan bidevre tîje bikin. Me bêriya wan kiriye. Yê li derve jî bila teqez me li ser kanal û hesabên me yê medya civakî bişopînin. Fîlm û naverokên pir xweş hene. Hevpeyvînen bi derhêneran re, sohbetên piştî nîşandana fîlman jî em ê li wir parve bikin. Werin tevli kelecana û coşa me bibin.

## BERNAMEYA 13. FESTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA LONDONÊ 13<sup>th</sup> LONDON KURDISH FILM FESTIVAL PROGRAMME

Vue Cinema	Vue Cinema	Vue Cinema	Vue Cinema
23.09.2022 <b>Friday</b>	24.09.2022 <b>Saturday</b>	25.09.2022 <b>Sunday</b>	26.09.2022 <b>Monday</b>
	- 13:00 -	- 13:00 -	
	<b>Panel 1</b> See page 8 for info	<b>Online Workshop</b> See page No. 8 for info	
	- 14:00 -	- 14:00 -	
	<b>Köy</b> <b>Ajotin</b> <b>Aisha</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>	<b>Sinjar</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>	
	- 17:30 -	- 17:30 -	- 17:30 -
	<b>The Dance Of Ali &amp; Zin</b> <b>My Name is Dekan</b> <b>A Voice From Far Away</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>	<b>Zalava</b> <b>13th May Cudi of the Wishes</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>	<b>Heskif</b> <b>Mother Tongue Room 217</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>
- 17:30 - <b>Gala Reception</b>	- 20:00 -	- 20:00 -	- 20:00 -
- 20:00 - <b>Neighbours</b> <i>Directed by Mano Khalil</i> <b>Opening Gala</b>	<b>The Exam</b> <b>Seven Symphonies of Zagros</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>	<b>Zero Nine</b> <b>Wind Girl</b> <b>Finger Print</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>	<b>Brother's Keeper</b> <b>Criminals</b> <b>War &amp; Color</b> <i>Followed by Q&amp;A</i>

■ Short Animation | ■ Short Fiction | ■ Short Documentary | ■ Feature Documentary | ■ Feature Fiction

**BERNAMEYA 13. FÊSTÎVALA FÎLMÊN KURDÎ YA LONDÔNÊ**  
**13<sup>th</sup> LONDON KURDISH FILM FESTIVAL PROGRAMME**

Rio Cinema	Rio Cinema	Rio Cinema	Prince Charles Cinema
27.09.2022 <b>Tuesday</b>	28.09.2022 <b>Wednesday</b>	29.09.2022 <b>Thursday</b>	30.09.2022 <b>Friday</b>
			- 18:00 -
			<p><b>Letters from Shengal</b>  <b>Laboratory No 2</b>  <i>Followed by Q&amp;A</i></p>
			
- 18:00 -	- 18:00 -	- 18:00 -	
	<p><b>Panel 2</b>                  See page No. 8                  for info</p>	<p><b>The Cold</b>  <b>The Other Side Of The River</b>  <i>Followed by Q&amp;A</i></p>	
- 20:30 -	- 20:30 -	- 21:00 -	
<p><b>Li Vir</b>  <b>Hêza</b>  <i>Followed by Q&amp;A</i></p> <p>---</p> <p><i>After Q&amp;A</i>  <b>Remembring Memo</b></p>	<p><b>Blackberry Season</b>  <b>Starting Over</b>  <i>Followed by Q&amp;A</i></p>	<p><b>LKFF Party</b>                  See page No. 10                  for info</p>	<p>- 20:00 -  <b>Imad's Childhood</b>  <i>Followed by Q&amp;A</i></p> <p><b>Award Ceremony</b></p>


■ Short Animation | ■ Short Fiction | ■ Short Documentary | ■ Feature Documentary | ■ Feature Fiction

# YILMAZ GÛNEY Û HIŞMENDIYA WÎ YA KURDISTANÎ

**SÎMON SULEYMANÎ**

Rojnamevan, Parîs

Em ê biserkevin,  
em ê mûtlaqa  
biserkevin.



Kurbûn û Kurdistanîbûna Yılmaz Güney jixwe ne cihê nîqaşê ye. Em kesên sînemahez, mîna misilmanekî bawermend ku bona xêrê ayetan dubare dike, em jî dixwazin vê rastiyê wek ayet tekrar bikin. Rastî ew e ku Yılmaz Güney hîna jî wek çirûskek agir rêya hemû hûnermendên Kurd ronî dike.

Enstîtuya Kurdî, sala 1984an li Parîsê Şahîya Newrozê çêkir. Şivan Perwer yekem car li wir got "Kî ne em?". Ciwan Haco yekem car li wir derket sahneyê û dengê xwe gijgijand. Yılmaz Güney jî dawiyê de derket û yekem car xebardaneke manifestoyî kir. Çimkî wî tim bi hûnera xwe xeber dida. Sal 1984 bû, 47 salî bû, bi zor û zehmet şîpya dima. Jixwe 7 mehan



piştî vê Newrozê ji nava me koç kir. Bi awayekî hestiyar derket sahneyê, li ber mîkrofonê destê xwe da newqa xwe û dawî li gotinê anî;

**“Em ê biserkevin, em ê mûtlaqa biserkevin!”**

Wî meseleya Kurd û Kurdistanê baş fêhm kiribû û li gorî pîvanên şoreşgerîyê rast pênase dikir. Digot milletê Kurd bindest e û gere azad bibe. Mîna hin mêjîreşên serdema xwe wekî meseleyeke sinif û feqîrî û despotiya beg û axayan binav nedikir. Hemû kêşeyên Kurdan ji bindestiya terîtoryal û netewî pêk dihat. Jixwe digot;

*“Êş, xizanî, bindestî, xwîn û hêsirên çavan ne qedera gelê Kurd e. Em vê çarenûsê nas nakin. Em dixwazin cihana xwe, axa xwe bi destên xwe bihesilînin û ji nû ve ava bikin.”*

Jiber ku hişmendiya tarî û mêtînger a devleta Tirk baş nas dikir, tenê çare wek Kurdîstana Azad didît û nexşerêya Kurdîstaneke azad û yekpare dida pêş Kurdan. Bi dengê bilind diqîrîya û digot em dixwazin li welatê xwe, li bin ala xwe mîna her însanî serbest û birûmet bijîn. Wî ti carî serê gotina xwe neditewand û rasterast digot, îro li çar perçeyên welêt, li bajar û kolanan, çîya û çeperan, li derva û zindanan hemû têkoşîna gelê Kurd ji bo Kurdîstana azad e.

Gotina wî ya dawîn divê wek manifestoyeke millî bê guhdarkirin.

*“Carinan du peyv dikarin rastiyê îfade bikin. Nivîsek, ramanek, qîrîna straneke ku dil disoje, pêleka ku li amûra muzîkê dixê jî*



*bombeya atomê bihêztir e. Ji ber vê yekê divê em bibin şervanên baş, di her qadên jiyane de bibin têkoşerên serkeftî û qezenckin. Divê em amûrê xwe baş, pir baş lêxin. Divê em stranên geleri yên xweş, pir baş bibêjin. Divê em çirokên delal, helbestên kubar, romanên xurt binivîsin. Divê em zanyar, dîplomat û teknîsyenên jêhatî perwerde bikin. Divê destê me hem pênûs, hem makîne û hem jî çekê baş bigire. Carinan divê amûra me çekek be, carinan jî çeka me sazê be. Em baş dizanin ku carinan tenê fişengek stranên herî baş, peyvên herî rast dibêje. Çiya, deşt û daristanên me li benda me ne. Em nazwazin hemû jiyana xwe li derve derbas bikin û ji derve stranan bêjin.*

*Gelê me bi lehengiya xwe destan nivîsîne, îrade û hêza me heye ku em hemû zehmetiyên li pêş xwe derbas bikin. Şoreşgerên demokrat ên Tirk, Faris û Ereb divê wek parêzvanên herî fedakar ê mafê çarenûsa neteweya Kurd, bibin beşeke têkoşîna me. Piştvanîya milletên bindest yek ji çekên me ya herî xurt e. Dost û dijmin bila her kes bizane ku em ê biserkevin, em ê mûtlaqa biserkevin... Mirina azadîxwazan ji jiyana koledaran çêtir e."*

Hişmendiya cenabê wî, têra xwe zelal û Kurdistanî bû. Di çarçoveya bîrdozî û binehişê wî yê hunermend de, sînora derdora watanê wî yê bindest dîyar û eşkere bû. Jixwe di filma xwe ya bi navê *Yo!* (1982) de ew Kurdistan kiribû tabelaya rê û dabû ber çavên dagirkeran. Gelekî zû ji nav me mala xwe bar kir helbet, lê ew sekna wî û ew kesayeta wî tim mîna stûnekê li orta doza Kurdistanê azad û yekpare çik disekine.

# KURDÎ COUTURE: CILÊ KURDÎ DIKE XEMLA KEÇÊN BIYANÎ

**HEVPEYVÎN  
EROL BAŞAK**  
Rojnamevan, London





## **Keça Kurd Prosha Ahmad li Londonê kargehek vekirîye û ew xîzmeta çanda Kurdî dike. Hûnê bêjin baş e, lê çawa?**

Prosha digel meta xwe ji Kurdistanê qumaş û aksesûarên Kurdî tîne û li Londonê di kargeha xwe de didrû ye. Marqeya wê Kurdi Couture piştî pandemiyê eleqeyeke baş dibîne. Cilên ku bi destê wê têne neqîşandin û xemilandin niha li ser keçên biyanî reklama çanda Kurdî dikin. Ew dibêje gelek keç ji bo rojên xwe yê taybet, wek mînak dawet, ji me daxwaza cilê Kurdî dikin. Me pê re hevpeyvînek kir Binêrin ka Proshaya delal çî bersiv dane pirsên me.

### **Kurdi Couture çî ye? Tu li vir çî karî dikî?**

Kurdi Couture marqeyeke nû ya cilûbergên modayê ye. Em ji bo demên taybet cil û bergên xemilandî, neqîşandî û bi morî pêşkêş dikin. Stîla me ji ya ku li sûkan peyda dibe cûda ye. Me ji cil û bergên kurdî yê kevneşopî îlhama xwe hildaye.

### **Te çawa û kengê dest bi vî karî kir? Fikir çawa derket holê?**

Me di sala 2020î de hêj ku kovîd derneketibû ev kar ava kir. Fikir ji nişkeva hat, dema ez ji bo betlaneyê çûbûm Slêmanî, Kurdistanê. Ya rast, her dem niyeta min hebû dest bi karekî Kurdî bikim, bi gera xwe ya Kurdistanê min bawerî bixwe anî ku dest bi vî karî bikim. Ji bo vê yekê min bi çend endamên malbata xwe re li ser vê mijarê nîqaş kir û wan jî pir piştgirî dan min.

### **Hûn çawa materyalan peyda dikin û dibijêrin?**

Hemû malzemeyên me ji Kurdistanê ne. Ew ji hêla hevkarên min Asya ve têne bijartin û anîn. Ji ber vê yekê em malzemeyên xwe ji bazarên Slêmanî an Hewlêrê distînin. Em bi rastî dezgeh bi dezgeh digerin da ku bibînin ka çî xweş û nû ye. Û bêguman divê em piştrast bikin ku ew bi qalîteya baş e. Em gelek hevrişim û qedîfe distînin. Çî tiştên baş li ber çavên me bikevin em dikirin.

### **Yanî Kurdi Couture bi eslê xwe Kurdistanî ye?**

Kurdi Couture marqeyeke kurdî ye ku navenda wê li Londonê ye. Ji ber vê yekê cil û bergên me di destpêkê de li Kurdistanê dihatin çêkirin lê niha makîneyeke min a dirûnê li vir heye loma koleksiyona nû li vir tê çêkirin. Lê dîsa jî em malzemeyan ji Kurdistanê werdigirin, ji ber ku tiştên herî baş li cilên me tînin li wir hene.

### **Li ser daxwazek taybet çêkirina cilekê çiqas dem digire? Û hûn dikarin pêvajoya çêkirina wê berfireh bikin?**

Ji bo daxwaziyekê taybet em dibê 4-5 hefte. Lewra em dixwazin hîn bibin ka xerîdar li çî digere tiştêkî çawa dixwaze, kîjan aksesuar lê tînin, heke xwestibe. Piştî em materyalan peyda dikin û tînin vir, li vir çêdikin. Piştî ev hemû pêvajoyên temam bûn em li Londonê cilê teslîm dikin. Pêvajoyekê dirêj e.



## Hûn tenê kincên jinan çêdikin, newisa? Hûn ê kengê dest bi çêkirina cilê mêran bikin?

Heta niha em tenê cilên kevneşopî yê jinan çêdikin. Me li ser daxwaza taybet cilê zarokan jî çêkirine. Lê yê mêran em niha çênakin. Di rojên bê de em ê dest bi çêkirina wan jî bikin.

## Mişteriyên we kî ne? Qey tenê Kurd in?

Na, ji çar aliyên cîhanê mişteriyên me hene. Ji bo me pir balkêş bû, ji ber ku me hêvî dikir piraniya mişteriyên me kurd bin.

Bi rastî pir xweş e û belkî cihê kenê ye ku ez bi hin xerîdarên xwe re bûm heval. Di destpêkê de ji bo her yekê wan şokek e, dema ew dibînin ku xwedîya vî karî çiqas ciwan e. Ew bi rastî hêvî nakin ku yeka mîna min ciwan bibînin. Dûv re em hinekî hevdu nas



dikin û paşê li ser cilan nîqaş dikin. Dema ku ew ne kurd in, ez her gav meraq dikim ku bizanibim çima wan biryar daye ku cilê kurdî li xwe bikin. Wek mînak ji ber çî te biryar da ku tu cil û bergên kurdî li xwe bikî? Yek ji mişteriyên min ji Erebîstana Siudî bû. Min pirsî te çima cilê kurdî kirî? Wê got ez bi Kurdekî re zewicî me û dixwazim di newrozê de jê re sûprîzê bikim. Min dîsa pirsî hûn çawa zewicîn? Wê got ez û malbata xwe rojekê çûn Tirkîyê. Me ji xwe re xaniyek kirê kir. Lê pirsgirêkek di xanî de derket. Li ser vê me jî gazî xweyê male kir. Gava mêrik hat me şîv danîbû. Mesele safî bû lê me got tu jî were bi me re şîvê bixwe. Piştî têkiliya min pê re dewam kir û piştî çend salan em zewicîn.

## Miştiriyên we gava cilê we dibînin an jî dikirin çî dibêjin, çawa behs dikin?

Miştiriyên me birastî gelekî ji cil û berg û çanda me Kurdan hez dikin. Û her carî jî behs dikin ji me re û pesnê çanda me didin. Ev ji bo me pir xweş e. Jixwe em delaliya çanda xwe dizanin û sedema destpêkirina vî karî jî ev e.

## Niha karê we çiqas mezin e? Ma ew mîna plana we dimeşe an ew ji ya ku we xeyal dikir jî çêtir e?

Marqeya me di nav civata Kurdên Londonê de tê naskirin. Em hêvî dikin ku di demek nêzîk de bigihîjin girseyeke mezintir. Gava di dema pandemiyê de me ev kar ava kir, destpêkek hêdî bû kar zêde tune bû lê îsal



marqeya me bilez mezin bû û eleqeya jê re zêde heye. Elhemdulillah ew pir baş diçe, potansiyela wê pir zêde ye.

### **Wek Kurdi Couture we çi mîsyon daye ber xwe?**

Weke keseke Xwedî lîsansa kargerîyê, min her tim niyet hebû ku rojekê dest bi karê xwe bikim. Lê ji bo ku ev kar serkeftî be, lazim bû min tiştek wisa bidîta ku ez jê hez dikim.

Firotin û danasîna çanda Kurdî ji pereyên ku em jê qezenc dîkin zêdetir bi min weke serkeftinekê ye. Cilên me yên kevneşopî gelek bedew in û xwedî dîrokeke mezin in. Cilê Kurdî heq dike ku di qada navneteweyî de were naskirin û qedrê wê bê zanîn.

### **Wek pirsê dawî ez dixwazim hestên we hîn bibim. Dema tu dibînî ku kesên ji neteweyên din cil û bergên kurdî yên ku te ew çêkirine li xwe kirine, tu çawa hîs dikî?**

Ev yek min, wek kurdekî, pir serbilind dike. Ev tenê destpêk e. Ew ê di pêşerojê de gelek mirovên mezin cil û bergên me li xwe bikin.

### **Gelek spas Prosha delal. Tiştek din heye ku tu dixwazî lê zêde bikî?**

Ez spas dikim ji bo dem û hewldanên we. Spas ji bo eleqeya we ya li ser Kurdi Coutureê û spas ji bo ku we di kovara xwe de cî da me. Em hêvî dikin ku di pêşerojê de dîsa bi we re bixebitin.

### **Miştêriyêke Kurdi Coutureê hestên xwe wiha tîne ziman.**

#### **Zara-Kurdekê li Avustralyayê**

Ji Kurdi Coutureê gelek hez dikim. Kêfa min tê ji wir tiştina bikirim. Gerdan û guharên kevneşopî pir xweş bûn. Zehmet e ku meriv aksesûarên kurdî li înternetê bibîne, nemaze yên ku bikarin ji bo Avusturalya bişînin. Ez gelek bi aksesûarên Kurdi Coutureê kêfxweş im. Lewra ez dikarim wana li xwe bikim da ku çanda xwe ya kurdî diyar bikim û hîs bikim ku parçeyek ji Kurdistanê li cem min heye.



# ENFAL

## BI SÛREYA QURANÊ KURD HATIN QETLKIRIN

**ERCAN DAG**

Rojnamevan, Stenbol  
ercandagk24@gmail.com





*“Di rojêke germ a meha Gulanê de gelek jin û zarok li qemyonên leşkerî ku her çar aliyên wan girtî, tîn siwar kirin û ber bi çol û çolistanên Iraqê ve tîn şandin. Hundirê qemyonan, gelek germ e ku bîhna hin zarokan diçike û ji ber germê dimirin. Axirî, li cîhekê qemyon tîn sekinandin û av li rêwiyên tîn dayîn, lê di nava avê de jî maddeyêke kîmyewî heye ku jin, zarok tev pê diêşin. Yek û yek dest û çavê hemû rêwiyên li qemyonan tîn girtin û li çalên mezin tîn avêtin. Leşkerên Iraqî, bi çekên qeleşnîkofê gule berdidin ser jin û zarokên dest û çav girtî yên li nava çalan. Di nav de jinikeke ducanî jî hebû ku ji ber guleyên lê dikevin, zikê wê tê perçekirin.”*

Ev gotinên Teymur Abdullah Ahmed ê Kurdê Germiyaniyê yê Başûrê Kurdistanê ye ku di vê çala mirinê de wek birîndar xelas dibe. Şahidê komkujiyê, bi çavê xwe bi awayê hovanê kuştina dayik, xwişkên xwe û gelek Kurdên din dibîne. Dîmenên Ahmed dibîne, weşeta komkujiyê Enfalê nîşan dide.

*Li deverên cuda yên Iraqê bi dehan çalên mezin ji hêla leşkerên Iraqî ve tîn vekirin; jin, zarok, pîr jî tê da bi deh hezaran Kurd dest û çavê wan girtî, bi saxî bi destên leşkeran ve tîn veşartin. Loma ji bo komkujiyê Enfalê pênaseyêke wiha tê kirin: “Mirov dimire, piştê tê veşartin. Lê bi deh hezaran Kurd hatin veşartin, piştê mirin.”*


Ji wan çalan hêj hestiyên qurbaniyan bi temamî hatine derxistin. Di operasyona enfala li ser mîrên eşîra Barzaniyan de 8 hezar mîr hatibûn kuştin. Meha çeyî hestiyên 100 mîrên Barzanî ji Bexdayê hat anîn Hewlêrê. Di merasîma veşartina cinazeyan de Serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî jî beşdar bibû. Serok Barzanî got ji bo dîtî û anîna hestiyên qurbaniyan xebata wan dê dewam bike.

## Navê komkujiyê, nîşaneyê meşrûkirina kuştina Kurdan e?

Yek ji êş û trajediyên mezintir ku di dîroka Kurdan de cîh digire komkujiyê Enfal e. Di sala 1988an de bi fermana Saddam Huseyin ê Serokkomarê wê çaxê yê Iraqê, li dijî Kurdên Başûrê Kurdistanê jenosideke mezin tê kirin. Di komkujiyê bi navê Enfalê de jin, zarok, pîr û kal tê da nêzîkî 182 hezar Kurd tîn kuştin.

*Enfal ku sureteke ji Qûranê yê û wateya wê “Xanîmetên Şer” e li navê vê operasyona li dijî Kurdan tê kirin. Yanê kuştina Kurdan, milkê Kurdan li xwe dîkin ferz û hela! Weke DAIŞê. Di ser komkujiyê Enfalê re 34 sal derbas dibe lê rêbazên hov ên li Kurdan tîn kirin bi dawî nabe.*

Di salên dawî de li deverên cuda yên Iraqê, gelek gorên bi kom hatin dîtîn. Li gor ragihandina hikumeta Iraqê, heta niha 70 gorên bi kom hatine dîtîn. Ji wan mezelan jî hinek hatine vekirin. Cîhê gelek qûrbaniyan jî hêj nediyar e.



**Komkujîya bi navê Enfalê, ji 8 qonaxan pêk tê:**

**Qonaxa yekem** a komkujîyê, di 23ê Sibatê 1988an de li devera Cafayetê ya Silêmanî dest pê dîke heta 18ê Adarê dewam dîke.

**Qonaxa duduyan** a komkujîyê li devera Qeredaxê ya navbera Hewlêr û Silêmanî tê kirin di heman salê de ji 22yê Adarê heta 2yê Nîsanê didome.

**Qonaxa sisyân** a komkujîyê li herêma Germiyanê di navbera 7 û 20ê Nîsanê de pêk tê.

**Qonaxa çaran** a komkujîyê, di 3ê Adarê de li Qelay Sewke û li Deşta Zeyfî Biçûk dest pê dîke heta 15ê Adarê berdewam dîke.

**Qonaxên pênc, şeş û heft-emîn** ji 15ê Adarê heta 25ê Adarê li deverên Şaqlawla û Rewanduzê pêk tên.

**Qonaxa dawîn** a komkujîyê li tevahiya herêma Behdînanê pêk tê ku ji 26ê Adarê heta 9ê Îlonê didome.

Di jenosida Enfalê de 30 navçe, 4 hezar û 500 gund tên tarûmarkirin. Gelek dibistan, nexweşxane, mizgeft û dêr tên xerakirin. Ji ber êrîşan, herî kêm 1 milyon Kurd, ji Başûrê Kurdistanê koç dikin.

*Talan û êrîşên bi destê hêzên rejîma Baas a Iraqê ku bi awayeke sistematîk pêk tê, armanca komkujîya Enfalê jî nîşan dide: Koka Kurdan were rakirin, demografiya deverên Kurdistanê were guherîtin.*

Herêmen êrîş lê hatine kirin jî ji bo têkoşîna azadî û serxwebûna Kurdistanê herêmen stratejîk û girîng in. Loma bi taybet pêşî êrîş li van herêman tên kirin da ku şoreşa Başûrê Kurdistanê were têk birin.

Saddam Huseyin ê ku fermana jenosida Enfalê dabû negihîşt armanca xwe, piştî demekê hat darvekirin lê belê şoreşa Kurdên li Başûrê Kurdistanê çû serî.

Komkujîya Enfalê 14ê Nîsanê sala 2008an ji hêla parlamen-toyên Kurdistan û Iraqê ve wek "Jenosid" hat pejirandin û ev tarîx wek salevgera Enfalê hat destnîşankirin.



# TÊKÇÛNA NOMOSÊ

## NECAT ZIVINGÎ





Mirovahîyê agir dît, xwarin pê çêkir, xwe germ kir di serma û seqemê de. Xiraban pê mal û mirov şewitandin. Ocax kor kirin.

Mirovahîyê kêr çêkir. Tiştên hişk pê jêkir, nêçîra xwe pê kir. Xirab û xêrnedîyan ew di sing û piştta mirovan de çikandin, pê xwîn rijandin.

Mirovahîyê dîwar lêkir, kehê çêkir. Diz û dagirkeran xwe di wan de parast û bi ser yê din de girtin, talan kirin mal û milkê wan. Kirin dewlemendî anîn li qesr û qonaxan xwarin.

Mirovahîyê peyker çêkir. Bi dirb û delalîya wan bîra xwe zindî kir. Bêmêjîyan ew kirin pût û perestîna wan li ser yê din ferz kirin.

Mirovahîyê nivîs îcad kir. Bîra xwe pê parast, dîrok nivîsî. Derewkaran derewên xwe pê belavkirin.

Mirovahîyê pûl û pere çêkir, danûsitendina xwe bi lez û hêsan kir. Bazirganên xapînok pere ji pereyan çêkirin, çerxa bac û mêtingehîyê danîn.

Mirovahîyê keştî çêkir, çem û behr derbas kirin. Şûm û diz û fêlbazan bi ser girav û welatan de girtin wêran kirin.

Medyaya sosyal jî wisa ye. Derfeteke zêrîn e. Ji bo zêdekirina zanîne, ronakkirina hişk, naskirina hev. Lê ji fesad û fitnebazan re jî derfeta dezenformasyon û pêvedan û vereşîne ye.


Tu çi bikî wê xayîn û xirabmal tê de birîn. Her kes li gor ce-whera xwe tevdigere. Mar û dûvpişk bi mirovan vedidin, hesp û çêlek mirovan xwedî dikin. Şêr serfiraz û sergezve in; rovî tim li pey fêl û fen û xapa ne. Teyr li asîmanên bilind û bêdawî difirin. Bilbil li

ser şaxan dixwînin. Ker li erdê dizirin. Dil ji kêzik û kelmêşan dixele.

Dîroka mirovahîyê her ev e: çêkirin û xirabkirin. Çêker û xirabker. Piranî, xirabker in. Li cîhanê kevir bi milyonan hene, lê kevirên almas bi sedan in. Yê bi qedr û nîrx tim kêr in. Li hember hezar kesî encex başek hebe. Ew jî di nav yê din de wînda û biguman e. Gazî hişk xwe bike! Bila dûr neçe. Ew sed xirab û başek tev li derdora te ne. Bira, hezkirî, heval û nasên te ne. Lê tu jî mafdar î! Naskirin jî meharet e. Kêr kes dikarin qenc û xiraban ji hev derxin.

Çêkirin zehmet e. Roj û meh û salan dixwaze. Zanîne dixwaze. Hez û hêz û hevkarîyê dixwaze. Dilsozîyê dixwaze. Kedê dixwaze. Lê xirabkirin? Dil û mêjîyekî sergo û çirav jê re bes e. Kêlîyek bes e. Gotinek bes e. Gumanek bes e.





Augustînûs bi sê-çar peyvan digot: “Rem viderunt, causam non viderunt” (Ya bû dîtin, ne sebebe wê). Lewma tê gotin: “Heger tu çîroka min nizanibî, nikarî min darizînî”. Çîrokzanîn ne kurtepişt û fesadî û şimopivî ye.

Kes li xwe nanêre. Kes xwe nizane. Hê xwe nas nake, bi hêsanî mirovan nas dike û pênasê dike! Îcar xwenasîn jî rêwîtiyeke heta dawîya temenê mirovî didome. Qey pêşîyan belasebeb gotine: “Heta xwe nas kir; emrê xwe xilas kir”. Û lê zêde kirine: “Xwenas, çêtir e ji mêrxas”. (Rast e; di gotina pêşîyan de ‘mêrê xwenas – mêrê mêrxas’ derbas dibe, min zayend notralîze kir) Pêşîyan evqas şîret li me kirine lê gotin bi sere me neketîye. Lewma ji bo me hê jî mêrxasî di ser xwenasîyê re ye.

Mirovên qenc û xwenas, xwedî pîvan û prensîb û rêbaz in. Nomosa wan heye. Ne di civatê de, di hişê xwe de jî şerma wan heye. Yên xirab û xwenezan bênomos in, bênamûs.

Ji Yûnana antîk û vir ve, 2500 sal in mirovahî peyva nomosê bi kar tîne. Ji sirûştê dizê, danûsitendinên civakê av dide. Lê kambax be! Nomos hatîye di nav me de li doxîn û navranê asê maye. Mêjî ji jor, daketîye jêr. Lewma derew, buxtan heta kuştin jî bi qasî kurtepiştî navranê bala vê civakê nakişîne.

Nomos zanîn û xwenasîn e. Ji hizirînê heta tevgerînê, pergala û prensîb in. Çêkirin û avakirin e. Zêrevanê aramîyê ye. Mirovahî bi nomosê dikare fitne û fesadîya xirabîyê sînardar bike û agirê wê bitefîne. Yan na wê ruhê xwe pûç, ocaxa xwe kor bike.

Berê digotin “Heya rastî rabe ser xwe, derew sê caran li dinyayê digere”. Sê car, di serdema dijîtal de bûye sê milyon car. Serdema post-truth wê post-nomosê encam bide gelo? Belkî jî mirovahî êdî dikare xwe bikuje. Yan jî mirovahî ji zû de termekî genî ye li rojhilata navîn. Şeytanqûnî ye. Bi xêra medyaya sosyal bêhn dide, her bêhn dide. Darikê hewdelê pîsîya xwe tev dide.

Nêzîk bû, ya nêzîk dibe. Gava ew dem hat, wê ti tiştê re li ber negire. Îcar hûn heyirî dimînin! Ji xwe razî, her dikenin, qet nahizirin. Qiyamet hebe, têkçûna nomosê ye.

# QEDRÎCAN NIVÎSKARÊ KESERKÛR Ê LI SIRGÛNÊ (ABDULKADÎR CAN (1911-1972))

**BIRAZIYÊ WÎ SERDAR CIWAN**

Rojnamevan, Mêrdîn





Qedrîcan, di sala 1911yan de li Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê ji dayik bûye. Navê wî yê rast ku li nasnameyê hatiye qeydkirin 'Evdîlqadir Ezîz Can' e. Navê Bavê wî Cano, diya wî Alya ye 5 bira û xweşkeke wî hene. Ew ji malbata Caferî ji eşîra Rûtan e. Bavê wî Cano, li Dêrikê tucar bûye û xwedî hişmendiyeke pêşketî bûye. Ji ber vê yekê jî hemû zarokên xwe daye xwendin.

Qedrîcan, dibistana seretafî li Dêrikê û ya navîn li Amedê xwendi ye. Piştî vê ligel hevalê xwe Reşoyê Dêrikî(Reşîdê Kurd) Lîseyê Dibistana Mamostetî ya Qonyayê qezenç dîke. Qedrîcanê ku ligel Reşîd li Qonyayê dibistana mamostetiyê dixwîne, hêj di wê heyamê de helbest û çîrokên Kurdî dinivîse û li ser dîroka Kurdan lêkolînan dîke. Di betlaneya havînê de tê Dêrikê, ciwanên navçeyê dide dora xwe û li baxçeyê bavê xwe perwerdeya rêziman û dîroka Kurdî dide ciwanan.

Di pola 2yem de ku hêj dibistan neqediya, ligel Reşîdê Kurd bi sûcê "dabeşkarî û cudaxwaziya welêt" tên girtin.

Piştî ji girtîgehê derdikeve ligel hevalê xwe dixwazin ku li dibistana xwe dewam bikin, lê belê him rêveberiya dibistanê û him jî ji ber fişara xwendekarên nijadperest nikarin ku perwerdeya xwe bidomînin.

Derbarê wî û hevalê wî Reşît de bi dehan doz tên vekirin û dîsa biryara girtina wan tê dayin. Ji ber vê yekê jî mecbûr dimînin ku Tirkîyê û xaka bav û kalê xwe biterikîne.

Ew û hevalê xwe Reşît biryarê didin ku bi awayekî qaçaxî derbasî binxetê angû Sûriyê bibin. Lê di dema rêwîtiyê de rastî komeke eşqiyayên Kurd tên. Koma eşqîya wan dişêlîne, pirtûk û nivîsên wan jî dişewîtnê. Ev bûyer, li ser jiyana wan a Kurdewarî tesîreke mezin çêdike û wan ji rê û doza wan nake. Qedrîcan, vê bûyerê weke ji ber nexwendîbûn û cahîltiya wan dinirxîne.

Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd, li Tirkîyeyê gelek rewşenbîrên Kurd tên girtin û gelek jî mecbûr dimînin ku derbasî binxetê bibin.

Qedrîcan, ligel Reşîdê Kurd, di sala 1931an de diçe Sûriyê mala Haco Axa. Piştî jî bi pêwendîya Haco Axa bi Qedrî, Ekrem Cemîl Paşa û Bedirxan re, bi nivîskarên mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Nûrettîn Zaza, Şahîn Bozan û Memdûh Selîm Beg re têkiliyê datîne.

Li Sûriyê ewil, salekê li bajarê Selemyê li ber destê Ehmed Wesfî Zekerîya dixwîne û pê re hînî zimanê Erebfî dibe.. Piştî ku xwendina xwe qedandiyê li bajarên Antakya, Serê Kaniyê, Hûmûs û Şamê mamostetî kiri ye. Dema ku li Antakyayê mamostetî dikir, bi keça memûrekî Stenbolî Nîlufê xanimê re dizewice. Ji vê zewacê jî bi navê Mizgîn, Serwer û Şêrîn 2 kur û keçeke wî xwedê dide.



Di sala 1932an de, hatiye Paytextê Sûriyê Şamê û tevî kerwanê “Komeleya Xoybûnê” dibe. Wek mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan, Qedrî Beg û Ekrem Beg, Cemîl Paşa, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Mistefa Bozan Şahîn, Haco Axa, Mistefa Ehmed Botî re xwe berdide nav karê kurdewariyê, nivîsandin û rewşenbîriya Kurdî..

Di 15ê gulana 1932an de ligel Mîr Celadet Bedirxan, birayê wî Dr. Kamûran Bedirxan, gelek nivîskar û rewşenbîrên Kurd kovara HAWAR'ê ava dikin. Qedrîcanê Dêrikî, bêguman mîrê helbesta Kurdî û pêşengê helbesta Kurdî ya nûjen e. Helbestên wî gelekî bedew, pêşketî û nûjen in. Qedrîcanê ku yek ji damezirînerê kovarên HAWAR(1932-1951),ROJA NÛ(1943-1946) û RONAHÎ'yê(1932-1951) ye, gelek salan bi helbest û berhemên xwe ev kovar xemilandiye.. Ew helbestvan, çîroknivîs û wergêr e. Qedrîcan, çi di helbestên xwe de û çi di pexşanên xwe de wî zimanekî xurû kurdî û resen bikar aniyê û neketiye bin bandora zimanê tirkî û erebî de. Wî ziman rast û durist bikaranî ye.

Di heyama ku Misir û Sûriye dibin yek, Qedrîcan di Wezaretê Perwerdê ya Sûriyê de wek memûrekî payebilind wezîfe dikir. Di vê heyamê de rejîma zordest tê ser kar û wekî gelek rewşenbîr û nivîskarên Kurd, wî jî digre û diavêje girtîgehê. Bi salan li girtîgehê rastî zilm û zordariyê tê û ji karê xwe jî tê derxistin. Gelek pirtûkên wî ku hatine weşandin ji aliyê rejîmê ve hatine berhevkirin, tune

kirin û ev kitêb û nivîs hêj wendayî ne.

Qedrîcan ne tenê helbestvan, çîroknivîs û wergêr bû, ew mîna mirovekî xebatkar, ramiyar, rewşenbîr û polîtîkavan bû.

Qedrîcan, di Tîrmeha sala 1957an de ligel komeke ciwanên Kurd, wek delegasyona Sûriyê beşdarî “Festîvala Ciwanên Sosyalîst ên Navneteweyî ya Sowyetan a Moskowayê” dibe. Li ser rê di keştiyê de helbesta bi navê “Ez Diçim Mosko” dinivîse. Tirkiye, Iraq û Îran di serî de ji gelek welatan rewşenbîr, ronakbîr û siyasetmedar beşdarî festîvalê dibin. Li Sowyet Rûsyayê bi rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd û biyanî re têkildar dibe û ji wan re behsa merselaya Kurd û çareserîya vê pîrsgirêkê dike. Li Moskowayê, serdana Profesor Qanatê Kurdo dike û li mala wî dibe mêvan. Her wiha, serdana Mele Mistefa Barzaniyê nemir dike û 3 rojan li mala wî dibe mêvan, li wir helbesta xwe ya bi navê (Serdarê Kurdan Berzanî), jêre xwendîye. Her wiha, li Moskowayê bi siyasetmedarê Kurd Mam Celal Telabanî, Doktor Qasimlo û hunermend Homer Dizeyî re jî hevdiîtinê dike.

Di sala 1958an de piştî vege-  
ra Berzaniyê nemir a Bexdayê,  
careka din diçe serdana wî û li  
Bexdayê Mele Mistefa Barzanî  
ziyaret dike. Di wê serdanê de,  
helbesta xwe ya bi navê (Şêr  
hat welat) jê re xwendî ye. Paşê  
ew helbest di kovara ‘Hêwa’ û  
'Azadî' de hatiye weşandin.

## ŞÊR HAT WELAT

Mizgîn.. mizgîn.. gelî Kurdan  
 Roja Kurdistan helat..  
 Barzanî hate niştiman,  
 şêr hat.. şêr hat welat..  
 Mizgîn li we, Barzanî hat..

çayê Zagros bê deng mabû,  
 Baxçe û bax bê reng mabû,  
 Ew meydana bê ceng mabû,  
 Roja Kurdistanê helat..  
 şêr hat welat.. şêr hat welat..  
 Mizgîn li we, Barzanî hat..

Ne xuyabû ji çend salan,  
 Ji bona derdê niştiman,  
 çû bû digerya, li derman  
 Roja Kurdistanê helat..  
 şêr hat welat.. şêr hat welat..  
 Mizgîn li we, Barzanî hat..

Mijde ji bo dar û beran  
 Deşt û newal li her deran  
 Roja Kurdistanê helat..  
 şêr hat welat.. şêr hat welat..  
 Mizgîn li we, Barzanî hat..

Li îraqê, Kurd û Ereb,  
 Azad bûne ji nîrê Xerb..  
 Li ser yek rê.. li ser yek derb  
 Roja Kurdistanê helat..  
 şêr hat welat.. şêr hat welat..  
 Mizgîn li we, Barzanî hat..

Dema ku Mîr Celadet Bedirxan di sala 1951ê de li Şamê diçe ber dilovaniya Xwedê, Qedrîcan vê helbestê li ser kêla ber serê wî û kalê wî mîr Bedirxan dini-vîse:

Mîrê kurd lawê Kurdistan  
 Neviyê Bedirxan



## CELADET

Fidakar xwedîyê himet  
 Cenekê wî ku di vir de binax bû  
 Giyanê wî bilindî asman bû  
 Di riya neştiman  
 Xwedî bi can  
 Giyanê xwe kir qurban  
 Ne mirîyê, zindîye  
 Navê wî ebedîye  
 15/7/1951

Qedrîcan, herî zêde bi çîrok û helbestên kurdî û wergera Kurdî ya berhem û pirtûkên ku bi zimanê biyanî hatine nivîsîn, tê naskirin. Wî pirtûka nivîskarê Rûs ya George Gırgiri Petrov a bi navê "LI WELATÊ ZENBEQAN" "ZAMBAKLAR ÜLKESİNDE" wergerandiye zimanê Kurdî û Erebî. Piştî vê wergerê wî gelek pirtûk û berhemên din jî bo kurdî wergerandi ye. Her wiha, helbesta Qedrîcan ya bi navê "Ez Diçim Mosko" di rojên "Festîvala Ciwanên Sosyalîst ên Navneteweyî ya Moskowayê" de xelata helbesta herî serkeftî ya zimanê nûjen distîne û ji aliyê rojnameya Rûsî ya 'İzveztîa' yê bi zimanê Rûsî tê weşandin.

## EZ DIÇIM MOSKO

Siwarê keştîyê bûm  
 Tevî pencsed hevalî  
 Her yek ji wan ji min bêtir  
 Hinek ji wan Erebin,  
 Hinek jê Çerkez  
 Hinek Kurd in  
 Hinek Ermenî nin  
 Lê hemu yek ziman û yek  
 Zimanê dostanî û aşitî  
 Weke bira, em diçin Mosko





Helbesta wî ya bi navê “Barzanî” jî ji aliyê wergêrên Fransî bo Fransî hat wergerandin. Di antolojiya Nîna Alîbegova ya bi navê Helbestvanên Rojava de jî gelek helbest û nivîsên Qedrîcan bo Rûsî hat tercûmekirin û weşandin.

Piraniya nivîsên wî di kovar û rojnameyên ku li Sûriyê û Libnanê derdiketin wek: (Hawar, Ronahî û Roja Nû), belav bûne. Çend helbest li Iraqê, di Kovara Hêwa, Gelawêj û rojnameya Azadî de jî belav bûne.

Ji bilî çîrok û helbestan, gelek gotarên wî di kovara (Hawar, Ronahî û Roja nû) de hene. Ji wan; “Gundê Nû Ava”, di Hawar hejmar 2an de, “Silêman Bedirxan” di hejmar 3an de, “Gelo ne wisa ne” di hejmar 10î de, “Bihara Dêrikê” “Şîna Xalê min” “Inqîlaba sor, Yaney serkewtin” û hwd....

Navê hin helbestên wî evin;” Cegerxwîn, Barzanî, Begê Axir zeman, Di şorezaregê de, Gula Sor, Perde, Dadê, Tabûta Bi Xwînê, Karwanê me, Hesinker, Ez diçim Mosko, Cejna Oktoberê, Çardeyê Gelawêjê, Berdêlk, Şîn, Dêrika Çiyayê Mazî...hwd”

Qedrîcan, hêj li Dêrikê bû li nav rezê zeytûnan ê bavê xwe ‘Cano’ darên gûla jî digihand û helbesta xwe ya bi navê “GULA SOR” jî li wir nivîsî ye. Helbesta wî ya “GULA SOR” ji aliyê hunermendê Kurd ê navdar Ciwan Haco ve hatiye bestekirin û bûye stran. Wekî Ciwan Haco, hunermend Temo, Hakan Can, Braderê Mûsikî û gelek hunermendên kurd helbestên Qedrîcan kirine stran û di albûmên xwe de cîh danîne. Wek mînak, Hakan can helbesta “Ax Welato” Brader helbesta “Ez mêvanê dilê te me” Hunermend Temo helbesta “Dêrika Çiyayê Mazî” dîsa Ciwan Haco helbesta “Perde” kirine stran.

Qedrîcan, di nav salên (1959-1961)an de hatiye girtin û di zindana Mezê de li Şamê çend salan girtî ma ye.

Qedrîcan, dema li Sûriyê bû fahm dike ku wê bê girtin, gelek berhem û pirtûkên xwe yê çapkirî û neçapkirî teslîmî cîranê xwe

yên jin û mêrên extiyar dike. Piştî çend salan ji girtîgehê derdikeve û diçe serdana wan jin û mêran ku emanetê xwe teslîm bigre. Dipirse ku jin û mêr mirine, xaniyê wan xira bûye û pirtûk jî wenda ne. Him rejîma zordest a Sûriyê pirtûkên wî tune kirine û him jî bê şansiyê tu carî dest jî wî berneda ne. Ji ber vê yekê jî gelek berhemên wî hêj jî wenda ne.

Ew gelek salan ji welatê xwe ji dê, bav û birayê xwe ji xaka xwe dûr li sirgûniyê jiyaye. Wî li ser hesreta navçeya xwe Dêrikê, Helbetsa bi navê Dêrika Çiyayê Mazî nivîsî ye.

### DÊRIKA ÇIYAYÊ MAZÎ

Dêrika Çiyayê Mazî  
Welat ê bav û kala  
Lê sed hawar û gazî  
Jê dur ketim çend salê

Ez li wê hatim dinyê  
Wê dergûşê hejandim  
Hey wax mala minê  
Dujmina jê revandim

Perçakê ji buhiştê  
Stêrka zêrîn welat  
Îro dest nagehiştê  
Ax û keser ji dil hat

Bax û baxçê bê hejmar  
Cî bi cî merg û zevî  
Li her derê av ên sar  
Ji kanîya tê dizê

Xwezî vê cara jî min  
Serê xabê bi dîta  
Bila ruhustîn canê min  
Hingî ji xwe re bistenda

Mixabin ji wî re bû hesret û ew careke din li bajarê xortanî û evîna xwe li Dêrika Çiyayê Mazî venegeriya, ev derfet çênebû.

Qedrîcan, roj û salên xwe yê dawîn ê jiyana xwe li bajarê Şamê derbas dikirin. Ew di 9ê Tebaxa sala 1972an de li Şamê li taxa Kurdan çûye ber dilovaniya Xwedê. Malbat û birayên wî dixwazin ku wî li xaka bav û kalan li Dêrika Çiyayê Mazî binax bikin lê ji ber qedexe û qanûnên wê heyamê yên Tirkîyê daxwaza wan bicih nayê. Bi beşdariya bi hezaran kesî ew li goristana Şêx Xalidê Neqşîbendî ya Şamê tê binaxkirin.

Ew ji aliyê Seydayê Cegerxwîn jî gelekî dihat hezkirin. Seydayê Cegerxwîn, di salên sirgûnê ya Qedrîcan de bi salan jê re rêhevaltî kir û ji ber wefata wî gelekî xemgîn bû. Seydayê Cegerxwîn, ji bo Qedrîcan helbesta bi navê "Ji Qedrîcan re" nivîsî.

Her wiha, Osman Sebrî ev çend gotinên wek helbestekê li ser kêla ber serê wî nivîsandîye. Hin kes jî dibêjin ku ev nivîsandin a Yûsiv Axayê Dêrikî ye.

Cenekê di vê gorê de  
Zor nazik û ciwan e  
Ji Dêrika Çiyayê Mazî  
Navê wî Qedrî Can e  
Hezar xweşî li gora wî  
Hozanekî Kurdan e  
Welatparêzekî qenc bû  
Rûhstî jê girtî can e  
Gorê xiste zikê xwe  
Ew jî kire qurban e  
Ji piştta me kurdan çû  
Ev zaneyê ziman e.



# DIEGO RIVERA

**SALOME CIZRAWÎ**

Blogger, Cizîr



Dink' mi vacador para la  
Bella y famosa artista Irene  
Pich y jué en la ciudad de  
Santa Barbara de  
la California de  
durante el mes de Enero  
del año de 1947  
Diego Rivera



Wênesazê Meksîkî Diego Rivera, dehayekî ewqas jêhatî ye ku hem fikr û ramanên xwe yên komunist raçandine resmên xwe, hem jî kariye sudeke bêpayan ji kapitalîzmê werbigre. Mirovekî ewqas belakir e ku malbata wî jî re gotiye *“Ew şeytanê berçavê li ser rûyê erdê ye.”*

Diego Rivera, bi şêwaza xwe ya serhildêr (protest) balê dikşîne ser xwe û hûnermendekî, hûnera xwe û hestên xwe yên şoreşgerî pêk ve honandiye û gihandine hev. Ji bilî serhildêriya pîr û pergalê wî ya polîtîk; em wî, bi têkiliyên wî û bi evîna wî ya sansasyonel a navdar a bi Frîda Kahloyê re jiyayî ya dîroka hûnerî de cih girtî nas dikin. Rivera, vejîna hûnera freskî li YDA û Latîn Amerîkayê pêk anî û keda wî gelek di bikaranîna freskî ya hûnera modern û mîmarîyê de heyê.



Rivera, ji ber berhemên xwe yê nîrsgirekên polên xe-batkarên vedikole, bu îlhama projeya serokê YDA'yê D. Roosevelt ya bi navê WPA (Work Progress Administration) ya ku di dema Qeyrana Mezin de bi saya dewletê ji karkêrên bêwef re karan payda dike. Ew, ji ber ku hem endamê Partiya Komûnîst a Meksîkayê bû hem jî di heman demê de têkiliyên wî bi dewletê re xurt bû hat rexnekirin. Ji ber ku ji bikirên xwe yê nîr dewlemend re tablo çêdikirin; bu sedema niqaş û devjeniyên. Taliyê ji partiyê (PKM) hat avêtin.

Di salên 1920 û 1930'an de D. Rivera, dûvrêzeya hinek tabloyên sereke yê nîr dewra mûralîzmê li Meksîka û li dinê ava bike çêkirin. Li Meksîkayê şoreşa hûnerî pêk anî û bi berhemên xwe civaka dinê vehêjand; deng veda. Hinek berhemên wî, ji rexneyên sîyasî bigre heta dadmendiya civakî, gelek tuwancên (îma) yê nîr demê wek metafor dihebînin. Wêneyê dîwarî yê bi bavê "Man at the Crossroads (Zelamê li Duryanê)" yek ji wan berhemên e.

Dema ku li Newyorkê dijiya, John D. Rockefeller Jr., ji wî xwest ku li ser lobiya mezin a balexaneyê nû hafî avakirina bi navê "30 Rockefeller Plaza"yê freskekê çêbike. Malbata kapîtalîst a ku bi dewlemediya xwe navûdeng, ew kompozîsyona Rivera, wek hizreke bi hurgilî ji wan re vegotî û "sosyalîzm û kapîtalîzmê bike di yek xebatê de" pejirandin; ew xebat "Zelamê li Duryanê (Man at the Crossroads) bû. Rivera, freskek bêhempa neqîşand. Lêbelê di serî de malbata Rockefeller û kapîtalîstên din gelek aciz bûn; tablo bu sedema niqaş, rexneyan û xirucirê. Gelo çira?

Bixêra tabloya niqaşdar a yek ji berhemên Rivera ya herî binavûdeng, ew tablo arîkariya şohreta wî dike. Ew tabloya ku bi navê "Zelamê li Duryanê" ( Paşê nav guhert û navê wê kir "Mirovê Venihêrê Gerdunê") gelek xirucurên mezin û niqaş li gel xwe anîn. Di nav wan bi sedan karakteran de "Lenin" bû sedema niqaşa herî mezin.



▲ Diego Rivera, Frida Kahlo



▲ Diego Rivera, Rockefeller Center, 1933



▶ Diego Rivera, Man at the Crossroads

Çapemeniya Amerikayê ev yek wekî propogandayeke antî-kapîtalîst pejirand. Di manşetên gazeteyan de hat pêşkêşkirin ku Rivera dest bi çalakîyên komunîstiyê kiriye. Malbata dewlemend jî bi destekbûna propagandaya komunîstiyê hat tawanbarkirin. Malbata Rockefeller, ji Rivera xwest da ku ew Lenin ji tabloyê derxîne. Rivera ev yek li wan vegerand û hewceyê guherîna tabloyê navê, dewsa ku ew vê yekê bike da zanîn ku ew ê tabloyê yekcar bişehitîne. Lê dewsa vê yekê lihevhatinek pêşkêş kir; wî dê lehengekî navdar ê Amerikayê û serok Abraham Lincoln ê li ser tabloyê bar bikira. Ev fikir ji hêla Nelson Rockefeller ve nehat qebûlkirin.

Rivera, li ber xwe da ji bo ku Lenin ji tabloyê dernexe, hingê malbata Rockefeller heqê wî dayiyê û ew ji malê da bidûrxistin, paşê freska ku bi navê "Man at the Crossroads" bû, anîn xwarê û ew bi temamî ji holê rakirin. Baş e ku asîstaneke Diego fotografê freskê girtibû. Lihevnekirina Rockefelleran û Rivera, bû semboleke têkiliya siyaseta, estetîk, azadiya afirinde û hêza aborî. Yê serkeftî wê dîsa Rivera bûya. Di dawiya sala 1933an, ew ê bihata qanekirin da ku ew li dîwarekî vala yê Palacio de Bellas Artesê dîsa ji nû ve resimê çêke. Hema hatûnehat Meksikayê ji fotografê sûd wergirt û dîsa fresk raçand û neqîşand. Bêguman tohîlîna xwe li çardorê resimê neqîşand! Îcar tevî li hêla rastê yê resimê Lenin, li hêla çepê yê resimê jî hêjariya însanan, şadiya malbata Rockefeller û ereqvxwarina wan bi hev re bûn. (Rockefeller di destê wî de şûşa martîni hatibû teswîrkirin.)




## Heger em tabloyê kûrûdûr venirxînin;

Însan, Mirovê Venihêr ê Gerdûnê, karkerekî li merkezê, makîneyeke behampa ya di wê duryanê de ya îdeolojiyekî polîtîk ê ku di wê serdemê de serdest e, bi rê ve dibe. Tîştê yekemîn ê ku balkêş e, sêwirîna însaniyetî ya ku bûye du par a îdeolojîk, kapîtalîzm û sosyalîzm. Rivera sêwirîna dinyayeke serdest a ku hefsarê serdema tevîhevbiyî ya polîtîk dike û di heman katê de digel dinyaya mîkroskobîk lêpirsîna duhatiya însaniyetiya ku li kûrahiya fezeyê difikire, dike. Hingê navê nû yê resimê dibe "Man, Controller of the Universe."

Rivera li ser cihêwaziyên baş û xirab yê însaniyetiye digel vê li ser cihêwaziyên civakên kapîtalîst û komunîst disekine. Di resimê de, cih dide lîderên komunîst û yê birçî, portreyeke John D. Rockefeller Jr.ê dewlemendê kapîtalîst ê ku xwedî li êş û azarên çîna binî ya karkerên bêkarmayî û portreyên dîtir jî. Ew ji me re welê nîşan dike ku, herkes dikare bi hev re perweriyê bibîne, bi hev re bijî û ji bo pêşerojê bi hev re dikarin bixebitin û ji bo dinyayeke hêvîdar vîzyonekê pêşkêş dike. Ev resimê dîwêr ê ku eserekî herî xweş ê çanda Meksikayê ye, encameke hunerî ya girîng a ku hemû bûyer û qewimînan di nava xwe de dihevine yê wê serdemê ye.

Li aliye rastê kapîtalîst û rasyonel; zanist, felsefe, şer, tahde, civak, teknoloji û temayên olî balê dikişînin. Li aliye çepê, aliye dijber komunîzm e. Li vir digel Vladimir Lenin, Karl Marx, Leon Troçki û Friederich Engels û şexsiyetên girîng ên Artêşa Sor, tên xuyakirin. Sembolên girîng ên dîtir yên ku li ber çavên me dikevin, satilên xwarinê, karkerên sanayiyê, ala sor û peykerê serjêbûyî ne.

Ya rast ew tiştê ku li serê tê rawestandî û ew tiştê ku di nava xetetiye de ye, wekî tevahî qedera gerstêrkê ye. Heke em bala vegeftinê navenda resima dîwêr ya Rivera, em ê hingê fîgura ku navê xwe da ye resimê bibînin: Mirovê Venihêr ê Gerdûnê. Fîgura mêrî ya ku di navenda resimê de ye, îdealkirina însanê modern (forma zayendî girîng e) a afirandina xwe yan jî ya derdora xwe ye. Li vir, ew însanê modern ê ku xwe ji qeydên kevneşopiyê û bendên fizîkî bi saya jîrekbûna xwe jê rizgar kiriye, heye. Wekî kontrola gerdûnî, dikare wext û fezayê li gor xwe bişekilîne, dikare bi rê ve bibe.



Li ser girikê aliye kapîtalîst (li aliye me yê çepê, li aliye rastê yê fîgurê navendî) bêbaviyên Şerê Cîhanê yê Yekemîn tên pêşkêşkirin. Rivera li ser teknolojiya (gaza bi jehr, tîfingên otomatîk, balefirên şer) ku neteweyên kapîtalîst wê çawa wekî hêzekî wêrankar bi kar tînin. Li hember vê, aliye jor ê komunîst (aliye me yê rastê, li aliye çepê yê fîgurê navendî) li ser îhtîşamiya Şoreşa Rus disekine. Heke em ji hêla rastê ve bidomînin, navên girîng ên tevgera karkeran (León Trotsky, Friedrich Engels û Karl Marx) em dibînin ku li binîya peykerekî bêserî yê ku xaça tewandî li ba dike ne.

Ev peyker Sezar e. Wextê ku çavên me ber bi aliye binî yê çepê ve dişemite, hingê em têdighîjin ku serê peyker jêbûyî ye û karker li ser rûniştine. Li aliye din ê kompozîsyonê, Rivera cih daye peykerekî din ê klasîk. Tevî ku destên figur tunebin jî, rûyê wî û birûska wî bi me nîşan dide ku ew Xwedawendê Yewnanî Zeus e.




Rivera van peykerên klasîk pênase dike û dîroka hunerî ya keleşporî (û zewqên yekta yên ku li pêş çavan e) û di heman demê de —li gor hizra xwe— di seranserê însaniyeyê de, rexne li wan kesên bijarte yên siyasî yên ku (ji Împaratoriye Serdema Entîk, Dêra Katolîk heya Faşîstan) tahde dane gelê xwe digire. Ji bo Rivera ev dewsa baweriyên derwîn serdestiya xwezayê û azadkirina otoritêya birêvebirina ji hêla karkeran ve were rûxandin, tê temsîlkirin.

Rivera, bi riya vê serjêkirina sembolîk, dewsa îdeolojiya serdest a komunîst a li Ewrûpayê, xwest li ser hizreke nû ya ku dê ji



bo wan bikêrhatî be, sekînî. Li hêla din tevî ku birûsk li ser peyker hebe û destê wî tunebin, dide xuyakirin ku di nav welatên kapîtalîst de wan bêhêz dixîne. Wextê ku karker bi polîs re şer dikin dewlemend (di nav wan de kesekî biberçavîk Nelson Rockefeller jî heye) li ber çavên me dikevin. Li nik Charles Darwin, John Rockefeller, Jr. bi jinekê re di pubekê de ereqê vedixwe. Li ser serê wan seheneke ji bakteriyên sifiliz tê pê, heye. (Sifiliz, bi riya têkiliya cinsî vedide, li vir vehesîneke tenik a zirav heye.) Li hember vê sahnayê em dibînin ku Lenin bi destên karkerên ku nijadên wan jî hevûdu cihê ne, girtiye.

Li pey Man at Crossroads de çîrokeke polîtîk û hunerî û mînakeke girîng a di dinyaya hunerê de azadiya xweffadekirinê dide xuyakirin û dikeve nav rûpelên dîrokê. Ji bo ku Rivera pir caran hêmanên vê resmê guhertiye, di derbarê versiyona wê ya yekemîn de pir tişt nayên zanîn. Li Muzeya Anahuacalli pênc gelaleyên vê xebatê yê jî hevûdu cuda tên pêşkêşkirin.




# DI MUHTEŞEMIYA “BÊDER” DE LÊGERÎNA ÎNŞAKIRINA DAHATÛYEKÊ; WELATEKÎ

**WELAT RAMÎNAZAD**

Antropolog, Amed

*Seba Porrojê*






Arîn Înan Arslan piştî deh salan, kurtefilmê xwe yê dawî Bêder(2020) kişand, di van rojan de jî li ser YouTube'ê belav kir. Berê jî wek Kırıntı (Ferek, 2004), Ba û Sî (2006) û Perra Berbange (2010) sê kurtefilmên din û belgefilmek bi navê Lorikên Anatolyayê (2017) çêkiribûn. Di wextê xwe de her kurtefilmê wî bi kalîte, estetîk, resenî, derhêneriya xwe di sinemaya kurdî de dengvedaneke mezin, bandoreke serobinker, heyecan û motîvasyoneke geş pêk anîbû. Di civatên sinemaya kurdî de derhênerî û sînemageriya wî pirî caran bû mijara sereke, li aliyekî din jî derhêneriya wî hêvî û xwebawerî da sînemahezên kurd.

Tê bîra min, cara yekem min berhama wî ya Ba û Sî temaşe kiribû, di wê demê de li rexmî qelsbûna bekgrawnda min a sînemayê jî temaşekirina “Ba û Sî” ez serobin kiribûm, gelek bandor li min kiribû...

Wek gelek dildarên sînemaya kurdî ji zû de bala min li ser wî ye û ez li benda berhemên wî yên nû me, di sala 2017an de li Dêrsimê ez û Porrojê çûbûn pirtûkfiroşxaneyê bi navê Baran a ku xwediyê wê ew e, li wir em rastî hev hatibûn, li ser pêyan me li ser sînemayê hinek sohbet kiribû, min ji wî pirsîbû, “çima filmên nû çênake” wî jî gotibû “ji ber tunebûna derfetên ekonomîk ez nikarim çêkim.”

Piştî deh salan, wî di sala 2020an de kurtefilmê xwe yê nû “Bêder” kişand, li ser Instagramê min kişandina pêvajoya vî filmî bi heyecan şopand. Di sê salên dawî de baş û xirab min xwe gihandibe kîjan filmên kurdî yên wek kurtefilm, film, belgefilm, animasyon yên ne tenê ji Bakur, herwiha ji sê çar parçeyên din ên welêt, min hewl daye ku li wan temaşe bikim û li ser wan binivîsim. Li ser sînemaya kurdî bi giştî perspektîfeke min çêbûye, bi qasî nivîsandina kitêbekê jî zanîna min çêbûye. Li gor van perspektîf û zanîna xwe ez dikarim ji bo filmê “Bêder” ê Arîn Înan bibêjim ku bi giştî di sînemaya kurdî



de yek ji baştirîn kurtefilma ye û di sînemaya me de filmên ku ez tam dixwazim temaşe bikim bi vî rengî ne.

Ji xeynî çend şexsiyetan çî edebiyata kurdî çî jî sînemaya kurdî xwîner û temaşevanên xwe yên baş û jîr ji ber bêkalîtebûna xwe ji xwe dûr dixwe, arasteyî zimanên din dike, meraq û bala wan kor dike, bêheyecan dike, motîvasyona wan dişikîne, nikare bersivê bide asta qayiliya wan, bi gotineke giran em dikarin bibêjin ku xwîner û

temaşevanên xwe yên herî baş û jîr dikuje!...

Di sînemaya kurdî de kurtefilmê Bêder vê diyardeyê dişikîne. Bi muhteşembûn, bikalîtebûn, resenbûn, tîftîzbûn, estetîkbûna xwe hwd. bala temaşevanên kurd û ên din dikişîne sînemaya kurdî hem jî motîvasyon, heyecan, meraq, xwebawerî û geşbîniya sînemahêzên sînemaya kurdî geş û bilind dike.

Derhênerên kurd dikarin fîlmên ku li dinyayê deng divedin çêkin? Erê. Temaşekirina Bêder nîşan dide ku derhênerên kurd dikarin vê yekê pêk binin û ji bo vê pirsê bersiveke erênî bi min dide dayîn. Muhteşemiya Bêder ez hem îqna kirim hem jî hêvî, bawerî û geşbîniya min berz kir ku em kurd dikarin fîlmên ku li dinyayê deng divedin çêkin.

Di vê nivîsê de ez dixwazim hewl bidim bê ka Bêder çawa ez îqna kirim û bawerî û geşbîniya min çawa berz kiriye îzah bikim, ez ê li serê vekolim bê ka di fîlm de zeman çawa problematîze kiriye û hewla însakirina dahatûyê daye, ez ê li ser çend aliyên muhteşem û muezem ên Bêder yên wek metoda analîza naverokê bisekinim û li ser Bêder xwendineke semiyotîk bikim.

Sehneyên fîlmê Bêder wek kolaj hev temam dikin, ji bo fehmkirin û ravekirina fîlm xwendina semiyotîk pêwîst e, çimkî Arîn Înan Arslan fîlmê xwe li ser vegotina semiyotîk ava kiriye. Di her sehneyê de îndikatoren hene.



## MUHTEŞEMİYÊN FÎLMÊ BÊDER ÇI NE?

### 1. Estetîk

Arîn Înan Arslan, bi hûrgilf, bi detay û bi tîftîz li ser hemû aliyên fîlmên xwe yên wek dekor, kostum, muzîk, lîstikvanî, çîrok, sînematoğrafî û sînematiîk fikirîye û kûr bûye û estetîze kiriye...

Di fîlm de sê zeman; rabirdû, îro û dahatûya neteweya kurd hene. Sehneyên fîlm her çiqas wek teknîka kolajî bibin jî, di nav hev de ne nakokbar in, di nav sehneyan de herikbariyek û ahengek heye. Dêrheneriya Arîn Înan Arslan li vir xwe dide der. Bi vê teknîkê ne wek flashback, bi sehneyekê zemanekî nîşanî me dide. Mînak, ka em binêrin bê ka derhêner têne bi sehneyekê çawa birîna salan estetîze dike û nîşanî me dide; dema ku lîstikvanê sermiyan ê "bi deriyê pişta xwe tê li orteya çem disekine, dengê helîkopteran tê, bi lez û bez derî vedike, bi vekirina derî dengê hewarek û nalînekê tê, sermiyan derî vedike, ji derî ve li hundir dinêre, em hundir nabînin lê ji êşa rûyê wî ya kûr ve em fehm dikin ku dîmenên bikovan, bikeser û biêş dibîne, li vir bibîrxistina Terteleya Dêrsimê û qetlîamên din dike.

### 2. Zewqa hunerî

Hema hema her sehneya fîlm muezem û muhteşem e. Herî zêde jî ji vî aliyê ve keyfa min ji fîlm re hat, min jê hez kir. Dema ku min "Bêder" temaşê kir, min xwest gelek sehneyan bisekinim, van sehneyên ku zewqeke hunerî ya bêhempa dida min, min xwest vê zewqê bisekinim, ber bihurîna wê bigirim. Min berê di çend nivîsên xwe de behs kiri bû, di sînemaya kurdî de diyardeyek heye; wek mezaxtina menzera û mekanên xweşik û spehî yên xwazayî yên hazir ez pênase dikim, ew dêrhener dibêjin qey bi mekanên hazir ên xweşik fîlmên wan jî baş dibin lê li gor konteksta fîlmên wan jî ev qet rûnanin, nakokbar in, Arîn Înan Arslan jî mekanên xweşik ên hazir bi kar anîne lê hem heqê wan mekanaan daye, hem jî di konteksta fîlm de rûdinin û ne nakokbar in.





### 3. Lîstikvanî

Arîn Înan Arslan gelek bi îsabet û hostayî lîstikvanên xwe hilbijartine. Lîstikvaniya Huseyn Hesên muhteşem bû, di sînemaya kurdî de yek ji wan aktorên gelekî baş e. Xwezî Mehmet Alî Konar di filmê xwe yê Govenda Elî û Zînê de Huseyn Hesên bikira lîstikvanê sereke yê filmê xwe, çimkî ew zêdetir li konteksa filmê wî tê.

Di peywenda lîstikvanên sînemaya kurdî de ciyawazî û nûgeriya Bêder ev e ku di derûnî û psîkolojî, tevger û nêzikbûnên lîstikvanan de, em melankolî, şîngirêdan, bohemtî, gazind û lome, bêhêvîti, qebûlkirin û xweradestkirina têkçûnan nabînin, li hemberî hemû tarûmarkirin, serobinkirin, sifirbûyînan lêgêrneke wan heye; lîstikvan li ser çareserî û çareyê wek xwedubarekirin û bêhereketbûnê naponije, nafikire, di ser lîstikvanê sereke re çareseriyek dîtîye, dixwaze vê çareseriyê pêk bîne, bi fikirîna fokusîya çareserker tevdigere.

### 4. Çîrok û Vegotin

Muhteşemî, muezemî û estîfîka Bêder di çîrok û vegotina xwe de xwe dide der. Çawa Arjen Arî bi risteya “navêkî min bû şikestin, navê din bû serhildan!” dîroka kurdan xulase kiribû, Arîn Înan Arslan jî bi çîroka kurtefilmekî dîroka me, rabirdû, îro û dahatûya me xulase dike.

Bêder çîrokên me bi vegotin û teknîkên nû, bi estetîzekirî pêşkeş dike. Bi Bêder sînemaya kurdî diyardeya sînoran derbas kir, ket qonaxê nû, sînemaya me ji xwe re li welatekî digere. Ji van hêlan ve Bêder dê ji bo sînemaya kurdî bibe feyz, motîvasyon, şewq...

### 5. Lêgerîna Welatekî an jî Deriyekî li Welatê Xwe Digere

Li piştî karakterê sereke deriyekî şîn heye, di nav berf, bager, bahoz û pûkê de digere... Di Bêder de berf, dewletên kolonyalîstan

û bêdewletbûna kurdan temsîl dike. Lêgerîna deriyê, lêgerîna welatekî bidewlet e. Lêgerîna serkirde, lêgerîna me ya sê sed salî temsîl dike. Lêgerîna derf, îmgêya xulaseya dîroke me dide, têkçûn û ji nû ve serîhildana me sembolarîze dike. Ma qey li seranserê dîrokê, li dû her şikestin û têkçûnê, em kurd li piştî xwe bi xalîçeyekê, deriyekî li ortê namînin?

Bêder, karê hunermenda hunera hevçerx a kurd, Nuveen Berwarî, anî bîra min, Berwarî di karê xwe yê hunerî de piranî li ser xalîçeyan dixebite. Xalîçe, bîra kolektîf a neteweyî ye. Fatîh Tan, di nivîsa xwe ya Gazete Duvarê de li ser Nuveen Berwarî dibêje; fonksiyona xalîçeyê tenê raxistina li erdê nîn e, aliyê wê yê bîrî û hafîzeyî heye. Ev di xebata “dîroka xalîçeyekê qasî dîroka neteweyekî” de xwe dide der. Çimkî xalîçeyê, di heman demê de bêwelatiya kurdan hilgirtîye piştî xwe. Kurd, dema ku ji ber qetlîam û kuştinên li welatê xwe revîyan, ji alaveke biqîmet zêde-

tir hewl dane ku xalîçeyekê bigirin ba xwe. Sedem jî, yek xalîçe dikare cihekî ji xwe re bike war, xanî, dudo jî dikare miriyan wek kefen bipêçe.

Mirovek bi deriyekî, di nav çiya, berf, bahoz û bagerê de li çi digere? Ma mimkun e ku derî, ji xwe re xaniyekî bibîne? Jixwe derî li xaniyekî nagere. Jixwe, film bê dîtî, çêkirina xanî diqede. Derî, ji xwe re li welatek, dahatûyeke bidewlet digere... Çimkî di bêwelatbûnê de, tu wateya xaniyekî, şatoyekê, vîlayekê, kelehekê tune ye, bi dîtî û peydakirina xaniyekî tiştek naguhere, çimkî heta ku welatekî bidewlet nayê însakirin dîrok her xwe carbare û tekerur dike.

Wek felsefîk û ontolojîk li ser têgeha derî, filmê Bêder malzeme û perspektîfên nû dide. Em tim li xaniyekî digerin lê deriyekî me heye, xanî tune ye. "Xalîçeyek" e me heye, jûr tune ye. Deriyê bêxanî, bêmal û bêjûr, bêwelat...

## 6. Problematîzekirina Rabirdû, Îro û Dahatûya Kurdan

Kurtefilmê Bêder, ji gelek aliyên ve li ser fikirîna rabirdû, îro û dahatûya kurdan malzemeyan dide me. Ji wan hêlan ve me dide fikirîn.

### \*Rabirdû

Bêder, nîşanî me dide ku rabirdû nabihure, dibe îro, îro bi rabirdûyê tijî dibe, deriyên ku ber bi rabirdûyê ve vedibin; trawma û êşên rabirdûyê, mey-



îtên me yên ku li erdê mane, nehatina li xakê spartin, em miriyên xwe yê bêmezêl û derî çawa ji meytên me re dibin gor dibînin.

### \*Îro

Bêder, wek temsîla rewşa me ya kurdan a îroyîn e; li hemberî tunebûyîyan, nemimkuniyan û tunekekan berxwedana dewamkirina hebûna xwe ye.

Wek felsefîk û ontolojîk û hebûnî, li gorî zagonên xwezayê gelo mimkun e ku mirov di nav befr, bahoz û bagerê de bêxanî û bêmal bikare hebûna xwe berdewam bike, tune nebe? Malbata ku bêxanî di nav berfê de dijî, gelo dikare zivistan, serma, berf, bahoz û bagerê têk bibe û bijî? Bi gelemperî film tam jî rewşa me ya îroyîn nîşan dide, şert û mercên ku em tê de xulase kirine. Wek ku karakterên film ji nav qetlîameke mezin, bobelatek, felaketekê filitîne, tiştekî wan nemaye, lê terka welatê xwe jî nekirine, di nav şert û mercên bêîmkan, kujer û tunekekan de dijîn, li ber xwe didin.

Di Bêder de rewşa malbatê, berxwedan û serhildana wan dişibe wek "kulîlk" a Arjen Arî.

*"bibare berfê*

*li ber xwe bide kulîlkê*

*berf li hêlekê, tu li hêlekê*

*hêviya min jî bihar e "*



Di Bêder de sehneyeke gelekî balkêş heye, em dînbûna lîstikvanê sereke dibînin, di nav deşta biberf de li ser maseyekê rûniştîye, difikire, lê edî ber bi dînbûn û gêjbûnê ve diçe; em dibin şahidê derbirîna tengezarî, ecizî, trawma, serobinbûyîna derûnî, têkçûyîna dînbûn, gêjbûna wî...

Piştî temaşekirina filmê bi navê “Taşrakirina Enqera”yê, min nivîseke Fîrat Aydınkaya di malpera Nûpel Haberê de xwend. Aydınkaya di vê nivîsa xwe ya asoveker û hayjêçêker de hewl dide navendbûna Enqera problematîze bike û ji bo ku Enqerayê ji bo kurdan ji navendbûnê derxe û bike taşra perspektîfêkê pêşkêş dike. Nivîsa Aydınkaya ji van hêlan ve qels maye; yek, qala Stenbolê û qala zimanê tirkî nekiriye, navenda me ya entelektuelî, zanîn û hunerî, bi vî deriyî dikevin dinyaya tirkî û Stenbolê. Du, kolonîbûyîna girêdayîbûyîna û mehkûmbûyîna e. Qet li ser vê sedema bingehîn nasekine. Jixwe dema ku kolonîbûyî bikare ziman û bajarê kolonyalîstan ji xwe re bike taşra, tişteki hunerî, entelektuelî, dîplomatîk, zanistî û hwd. tune ye ku ji wan fêr bibe û li xwe zêde bike, ev tê vê wateyê ku kolonîbûyî êdî xwe azad kiriye. Sê, Aydınkaya ji bo çareserîya taşrakirina Enqerayê perspektîfêke şênber pêşkêş nake.

Çareserî ew e ku mirov “qumaşên xwe” di qadên wek zanist, teknoloji, edebiyat, muzîk, werger û hwd. de bike giranbihatirînên dinyayê, ew jî bi fêrbûna zimanên fransî, almanî û îngilîzî yên ku dinyayê bi rê ve dibin û ji xwe re navendkirina Berlîn, Parîs û New Yorkê pêkanîn e.

Aydınkaya di vê nivîsa xwe de têgeha maseyê jê dipirse, min nedixwest di nivîsa wî de tenê li ser qismê maseyê bisekinim, ji ber vê min bi gelemperî qala nivîsa wî kir. Di navbera jêpîrsîna wî ya li ser têgeha mase û sehneya maseyê ya Bêder de min têkiliyek çêkir. Nivîsa wî ji bo fehmkirina îndîkatîkî ve alîkariya sehneya me dike. Nivîsa wî ji min re bû alîkar ku bikarim li ser vê sehneyê xwend-

inekê bikim. Aydınkaya di nivîsa xwe de dibêje, maseya ku kurdan nikarin tê de cih bibînin wek karakterên Dostoyevskî nebin melankolîk, wek karakterên edebiyata dij-kolonyal bi pehîna xwe maseyê xera dikin. Lê di film de em dibînin ku karakter bi maseyê ve hatine girêdan. Ne wek karakterên Dostoyevskî ne jî karakterên edebiyata dij-kolonyal alternatîfêke me tune ye. Û maseyê em trawmatîk, patalojîk, dîn kirine.... Rewşeke patalojîk û trajîkomîk e ku ne di maseyê de ji me re cî heye, ne jî ji me re dibêjin hûn azad in, dikarin bê vê maseyê bijîn, heta dibêjin em we ji maseyê azad bikin jî hûn nikarin bê mase bijîn, efendî her tim ji kole re digot tu bê min nikarî bijî, tenê me bi xulamtiya maseyê peywirdar dikin. Wê çaxê em çi bikin? Xelasiya ji maseyê dê çawa pêk bê?

### \* Hewla Înşakirina Dahatûyekê

Gelo ji bo kurdan dahatûyek heye ku em wek kurd azad bijîn?

Ciyawazî û reseniya Bêder bi giştî ji bo sînemaya kurdî ev e ku di Bêder de em hewla înşakirina dahatû-pêşerojê dibînin. Ez dibêjim qey yekane mînak e ku di sînemaya me de di xwe de avakirina dahatûyê dihevine. Di Bêder de li hemberî hemû kersatan, bobelatan, şert û mercên xwezayî kurdên ku terka welatê xwe û axa xwe nakin, jê narevin, bi axa xwe ve girêdayî ne, hewl didin jiyaneke nû ava bikin, dahatûyekê înşa bikin.

Gelo mimkun e ku bê xanî û bê mal di nav berfê û pûkê de, di nav şert û mercên tunekeker û kujer de bijî û bikare ji xwe re dahatûyekê ava bike?

Arîn Înan Arslan tam jî li vir derhêneriya xwe nîşan dide. Dibêje erê em dikarin ji xwe re dahatûyekê însa bikin. Wek diyardeyeke bêîmkan bibe jî, em dibînin ku di film de hewla însakirina dahatûyekê heye.

Di Bêder de hewla însakirina dahatûyê bi sê hêmayan xwe nîşan dide.

**Yek**, ji serî heta dawî Bêder lêgerîna însakirina dahatûyekê ye. Li piştta wî derî, karakter ji xwe re li dahatûyekê digere. Lêgerîna dahatûyekê, lêgerîna welatekî bidewlet e.

**Du**, di nav berfê de avêtina tov û çandina berfê hewla însakirina dahatûyê ye. Di sehneya dawî ya film de em dibînin ku karakterê sereke, genim diavêje zêviya biberf, bi hespê xwe dest bi cotê dike. Absurdî tê de heye? Gelo mimkun e ku di van şert û mercan de tov bigire? Ji bo me însakirina dahatûyek wek ku bêîmkan be!...

**Sê**, derhêner, karakterên xwe bi melankolî, şingirtin û reşbînî nexêzandine, fikirîna bi fokusa çareserker dide ber karakterên xwe. Di sifirbûyîna de ji nû ve xwesazkirin û afirandinê, plan û programa rizgarkeriya tîkçûnan dide ber karakterê xwe.

**Çar**, di sehneya dawî ya film de şadwerî û hezweriya zarokan



nîşanî me dide ku dêrhêner di hewla xwe ya însakirina dahatûyê de mutleq e. Dahatû ne bi êş, melankolî, kul, keser, kovan lê belê bi hezwerî, şadwerî, keyfxweşî, dilgeşî ava dibe. Bi wendane kirina wan hîs û hestan ava dibe. Spinoza di Etîka xwe de radixe holê ku dahatûyek çawa ava dibe. Hezwerî, şadwerî û keyfxweşî dikare hemû şert û mercên tunekeker û kujer tîk bibe. "Kulîlka şaîr" bi hezwerî û şadwerî dikare xwe bigihîne biharê.

*"Hew li kefa destê min binêre!  
Naxwazim ji min re bibêji  
ku dê bibim babê çend zarokan,  
zengîn bibim yan her wiha bim...  
Tenê tiştêkî ji min re bêje:  
Heta hebim, ez jî dê wek te bim  
yan jî dê bibim xwedî welat!"*

Ebdulla Peşêw di vê helbesta xwe de ji bo xwedîbûna dahatûyekê, welatekî ji falbêjî dipirse, ez ê bibim xwediyê welatekî, ne ku wek te her bêwelat bimînim? Ji bo însakirina welatekî û dahatûyekê, Arîn Înan Arslan deriyek vekirîye, ez dixwazim ji sînemaya kurdî bipirsim, gelo ew ê me ji rabirdûyê rizgar bike û me bike xwediyê dahatûyek û welatekî bidewlet?

Ji gelek alî û kontekstên din ve hêja ye ku mirov li ser sînemageriya Arîn Înan Arslan kûr bibe, xwe biêşîne û binivîse. Arîn Înan Arslan, bi derhêneriya xwe ya kemilî, pêşketî û geşbîn, her cure piştigiriyê heq dike, bi taybetî jî ya madî, sînema bê pere çênabe, hem jî ew ê heqê her piştigirî û destdayîna bide, ez hêvî dikim ku ev nivîs bibe wesîle ku dewlemendekî kurd bi qasî filmekî dirêj piştigiriyê Arîn Înan Arslan bike!?

# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheka sazgehiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

## Kovarên Endam



[W](https://www.facebook.com/KovargerênKurd)
[T](https://www.instagram.com/KovargerênKurd)
[F](https://www.youtube.com/KovargerênKurd)
[I](https://www.linkedin.com/KovargerênKurd)
[Y](https://www.tiktok.com/KovargerênKurd) /KovargerênKurd  
 ✉ KovargerênKurd@gmail.com

The **Hall** Kurdî  
 Endama Koma Kovargerên Kurd e